



Kirêti derdikevin holê **Dewleta tirk ditengije**

Rûpel. 3

Hewpeyvîn:

Divê huner gav bi gav
bi şoreşê re be.

R. 8-9

Raman-Ahmet Ivrendi:

Deyndarî, şehîd
û binbariya me


R. 6

Nirxandin:

Mirî ranazin
lê em?

R. 10

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Bêyî çeteyan şerê taybet nameşe

Dewleta ku berevaniya berjewendiyên çîn û gelê serdest dike, hewcedarî çeteyan e, lewre hemû karê xwe nikare li gorî zagonan bimeşîne. Ew rasfî di raporên fermî de jî hatiye zimên.

Kesên ku êrîşî ser Serokê Komeleya Mafên Mirovan Akın Birdal kiribûn, hatin girtin. Serokwezîrê tirk, derket bernamêyê televizyonê û daxuyaniyên jî sedî sed li dijî gotinên xwe yên berê dan. Qet nehat bîra wî ku ji ber gotinên xwe yên berê jî Birdal û raya giştî lêborîne bixwaze. Lê pesnê xwe de û da zanîn ku ew didin xwe ku serkêşê çeteyan Yeşil bigirin û derî li ronîkirina Bûyera Susurlukê vekin.

Li hêla din helwesta ku fermandarên tirk nîşan dane jî balkêş e. Li gorî nûçeyên ku di rojnameyên tirk de derketine, mijar hatiye rojewa MGK'ê û li wê derê fermandarên tirk, dilxweşiya xwe ji bo girtina êrîşkarên diyar kirine û dane zanîn ku divê hikûmet jî bo ronahî kirina bûyerê heta dawiyê biçe. Di civîna MGK'ê de dîsa hatiye gotin ku artêş şerê li dijî PKK'ê li gorî rêgezên mafên mirovan dimeşîne.

Ev gotin belkî bi hinekan xweş bîn, lê bûyerên ku her diqewimin, dimeneke cûda derdixin pêşberî mirov û bi vê dîmenê re gelek pirsên ku hewceyî

bersivandinê ne, xwe didin pêş;

Heke bi rastî hikûmet û MGK dixwaze bi ser çeteyan de biçe, çima hemû berpirsên Çeteya Susurlukê serbest hatin berdan? Ji ber çî heta duh Serokwezîrê tirk Mesut Yılmaz agahiyên çewt belav dikirin û digot; "Yeşil hatiye kuştin"? Çima qet li ser nûçeyên ku di çapemeniya azad de li ser çalakîyên Yeşil derdiketin radiwestiya? Ji ber çî wî dixwest bûyera Birdal bixwe stûyê tevgera azadîxwaz, tevî ku wî dizanî kes bi vê gotinê bawer nake? Heke dewlet bi awayekî derbest li Yeşil digere, ew çawa dikare here Başûr li ser navê dewletê ji bo anîna Şemdin Sakîk xebatê bike?

Her wiha heke dilê generalên tirk heye ku endamên çeteyan bigirin, çima der barê kesên mîna Veli Küçük, Korkut Eken de tu tiştî nakin?

Dîsa gotinên generalên tirk ên li ser şeweyê şerê ku ew li Kurdistanê dimeşînin jî dûrî rastiyê ye. Di kîjan rêgeza mafên mirovan de hatiye nivîsandin ku divê mējiyê kesên ku hatine kuştin bê belavkirin û leşker

mējiyê wan bavêjin ber kûçikan?

Em helwesta artêşa tirk ya li hemberî gerîla deynin aliyekî, leşkerên kurd ku heta niha bi destê hevalên wan hatine kuştin, gotinên generalan pûç derdixin. Heta niha bi dehan leşkerên kurd bi destê fermandarên wan ve hatine kuştin. Li gorî agahiyên, di operasyona Murat de çar leşkerên ku fîrar kirine hatine serjêkirin.

Ev tişt giş, rastiyekê diyar dikin. Ew jî tēkiliya çeteyan û şerê kirêt e. Dewleta ku berevaniya berjewendiyên çîn û gelê serdest dike, hewcedarî çeteyan e, lewre hemû karê xwe nikare li gorî zagonan bimeşîne. Ew rastî di raporên fermî de jî hatiye zimên.

Niha jî dewlet li hemberî gelê kurd şerêkî dimeşîne û bi riya hiqûqî nikare pê re serî derkeve, lewre jî dest davêje riya nehênî. Ji bo vê yekê jî çeteyan bi pêk tîne û bi kar tîne. Heta ew şer neqede pêdiviya bikaranîna çeteyan jî holê ranebe, hikûmet jî nikare bi ser wan de biçe. Divê em jî wisa li mijarê binêrin û li gorî wê xebata xwe bikin.

Dema hesabpîrsînê ye

RIYAD AHMED HASAN

Ferhengok

- arîşe:** problem, asteng
- aya:** gelo (acaba)
- berî:** deşt
- bestandin:** girêdan
- beyar:** cihê kir, (kuraç)
- balîç:** guliyê keçikan
- be daxewe:** mixabin, maalesef
- berevanî:** berhingarf
- beyanî:** sibe
- çak:** baş, qenc
- çeleng:** qeşeng, spehî
- derbest:** ciddî
- fermî:** resmî
- gengaz:** pêkan, mimkûn
- hawirde:** îthalat
- hezaz:** heyelan
- hinarde:** ihracat
- hind:** cem, nik, balê
- hîndekarî:** öğrenim
- lêborîn:** efûkirin
- lêqewmîn:** maxdûr
- kark:** qor, tûr
- kirêt:** qirêj, qilêr
- merc:** hoy, şert
- livbazî:** çalakî, faaliyet, (eylem)
- navgêrkirin:** arastekirin
- nehênî:** illegal, veşarf
- neks:** karin boşluğu
- nemaze:** bi taybetî (özelliikle)
- noker:** cahş (işbirlikçi)
- olam:** berdestê, xulam
- qelst:** lawazî, jarî (zayıf)
- qerase:** bi heybet, gir
- payendek:** paşgo (ek)
- peng:** gilokên ta yên bi dirêjkî.
- pengav:** çala avê
- pêdivî:** pêwîst, hewcefî
- rêgez:** prensîp
- stewîn:** kemilîn, perîşin
- şolyeker:** noker, cahş (işbirlikçi)
- tawan:** sûc
- têgihîştin:** fêmkirin
- tomarkirin:** qeydkirin
- zagon:** qanûn
- zal:** hakim

Bi taybetî di vê pêvajoyê de pêwîst e ku her kes hesabê xwe bide û bistîne. Yê ku xwedî hesab be, wê hesabê xwe bistîne. Yê ku bêheq û tawanbar be jî, wê hesabê xwe bide.

Lê belê di dîroka Kurdistanê de heya îro, yê ku bi nîrxên gelê kurd listiyê û li pêşiya bipêşketina civakê bûye bend û parçebûna neteweyî domandîye û her pêşkêşî dijmin kirîye, pêwîst e derkeve pêşiya gel û ji hesabdayinê re amade be. Her yek bi vî awayî bi navê kurd û Kurdistanê rabûye û gel xapandîye û tiştek ji bo gel nekiriye. Tu carî dem van kesan napejirîne. Ji ber ku yê mafê jiyanê azad û bi rîmet layiqî gelê xwe nebîne û pê bilîze, mafê wî tuneye. Lewre serxwebûn û serfirazî mafê her gelî ye. Lê mixabin mafên pêwîst û bîngêhîn ji dest van xayin û nokeran nebûye para gelê me. Ji bo vê yekê heza gel û dîrok ne gengaz e ku kesên wiha bibexşîne.

Bi taybetî parastina mafê jiyanê bi Tevera Azadiyê re derketiye holê. Tevera Azadiyê xwedî derketina nîrxên gelê kurd e û roj bi roj di çalakîyên xwe de van nîrxan dewlemend dike û diparêze. Ji ber ku gewşinên wê tevgerê yek jî xwestin û dayîna hesab e. Çiqasî hesab bide, ew qas jî hesab distîne. Ji ber ku Tevera Azadiyê pirtûka xêr û gunehan li ser navê vîna gel

û mirovahiyê daniye holê. Dewletên împeryalist û hevalbendên wan heyânî roja îro her tiştî bi serê gelê me de anîne. Her tiştî li ber çavên gel kirine dojeha tarî. Ev yek bi şerê taybetî hatiye meşandina û tê meşandin. Lewre dewleta tirk şolyekerê wan jî bo jiyanê serbixwe, an jî ji bo ramaneke serbixwe tu merc û mafên jiyanê ji gelê me re nehîştîye. Li aliyekî şewitandin, li aliyekî talankirin û li aliyekî jî windakirin, binçavkirin, koçberkirinê pêk tî-

winda dike. Her çiqas bireve jî, ji dayîna hesab xilas nabe. Ji ber ku hesab li ser rûpelên dîrokê hatiye nivîsandin.

Bi taybetî gerîlayên azadiyê roj bi roj rûpelên dîrokê li hev dixin. Tola sedsalan bi livbaziyan xwe distînin. Hemû qirêj û gemara neyar a ku hezar salan li ser axa muqedes belav bûbû, şervanên azadiyê bi livbaziyan xwe yên canfedayî axa muqedes paqij dikin. Bi xwîna şervanên azadiyê ya pîroz, rengê Welatê Rojê ji nû ve vedibe.

Dewleta tirk li hemberî dîroka mirovahiyê xwediyê tawanê mezîne. Dîrok tawanên giran nabexşîne. Ev jî dibe sedema reva dewleta tirk. Lê çiqasî direve tawanê xwe girantir dike û dostên xwe winda dike.

Her livbaziyeke gerîla xwestîna hesab û vekirina dadgehê ye. Dadgeh îro li dar e, biryar jî hatine standin. Serokê Rûpela Dîroka Nûjen wiha dibêje: "Hey gafil, rabe ser xwe, hey tawanbar rabe ser xwe, hey şolyeker rabe ser xwe, sîxur rabe ser xwe, êdî dema hesabdayinê ye." Gel ferman di-de û biryar distîne. Lewre ferman a gel û dîrokê ye. Gel û dîrok çî biryarê bide jî pêwîst

nîn. Her gav bangên Serokatîyê ji bo çareserîya arîşeyên mirovatî, aşfî, demokrasî û yekîtiya her du gelan pêk tî. Lê mixabin rêberên tirk her car li hemberî van bangan bêbersiv dimîne. Lewre tawanbarîya wî pir e, dûr e û dirêj e, bi seranserî tevahiya dîrokê ye. Ji bo vê, dewleta tirk li hemberî dîroka mirovahiyê xwediyê tawanên mezîne. Jixwe dîrok tawanên giran nabexşîne. Ev jî dibe sedemê reva dewleta tirk. Lê çiqasî direve tawanbarîya xwe giran û zêdetir dike. Li aliyê din jî dostê xwe

e pêk were. Ya ku îro pêk tî jî ev biryara gel û mirovahiyê bi xwe ye."

Heyanî roja me ya îroyîn her gay gel li pêşiya dadgehên mêtînger û serdestan bûn. Lê îro rewş hatiye berevajîkirin. Gel bûye dadgeh, zagon, biryar û ferman. Şervanên azadiyê jî, bûne dozger. Tu mirov nikare xwe ji ber van zagonan bide alî. Ji împeryalîstan bigire heyanî mêtîngerên tirk, ereb, faris û hevalbendên wan de hesab bidin gelê kurd û mirovahiyê. Lewre îro dadgeha mirovahiyê li Welatê Rojê hatiye sazîkirin.

Kirêti derdikevin holê Dewleta tirk ditengije

Dewleta tirk di 19'ê meha gulanê de dîsa başûrê Kurdistanê bi hev-kariya KDP û cerdevanan dagir kir. Her wiha dewleta tirk nêzîkî 50'î kontr-gerîla jî bi xwe re derxistine operasyonê. Wekî tê zanîn artêşa Tirkiyeyê berî vêga bi demek kurt dîsa başûrê Kurdistanê dagir kiribû. Piştî ku li dijî gerîlayan tîk çûbû ji herêmê vekîşiyabû. Li gorî vî encamê artêşa tirk di hemû operasyonên xwe de bi ziyaneke mezin, ji herêmê xwe dûr dixîne. Di operasyonên berî vêga de bi dehan leşker hatine kuştin. Tevî wê yekê gelek cebilxaneyên artêşa tirk jî aliyê gerîlayan ve hatine bi dest xistin. Li gorî agahiyan rûxandina zerîpoşeke hêzên tirk jî aliyê kameramanê MED-TV' ve hatiye kişandin û de di rojen pêş de pê nîşan dayin. Taktîka hêzên ARGK ya li hemberî leşkerên tirk û hêzên PDK'ê, ji aliyê fermandarê ARGK Osman Öcalan ve bi van gotinan hate ra-

bi daxuyaniyekê ev operasyon nixandî. Li gorî berdevkê ERNK'ê rêxistina Ewrûpayê armanca vî êrîşa dawî guherandina statûya başûrê Kurdistanê ye. Hate gotin ku Tirkiye, Amerîka û Îsraîl dixwazin li başûrê Kurdistanê dewleteke tirkmenan ava bikin.

Yeşil-dewlet û suikasta Birdal

Piştî suikasta Serokê Komeleya Mafên Mirovan Akin Birdal, çeteyên êskere yê di nav dewleta Tirkiyeyê de xwe bi awayekî zelal dîsa nîşan dan. Bi îfadeyên serleşkerê pîspor Cengiz Ersever kampeke veşarî derkete holê. Tevî wê yekê êskere bû ku fermana kuştina Akin Birdal ji aliyê serokê çeteya di nav dewletê de Yeşil ve hatiye dayin. Li gorî îfadeyên Ersever diyar dibe ku, ev demeke dirêj e ku ew bi Yeşil re planên êrîşê yê li dijî kesên aşîxwaz û partiyên siyasî digerin. Bi pey-

Di rêzê de ambargoya çekan heye

Dewleta tirk ji ber çaresernekirina kêşeya kurd û bînpêkirina mafên mirovan ji aliyê Yekitiya Ewrûpayê ve dîsa wekî dewleteke sicîlkirêt hate binavkirin. Di heftiya derbasbûyî de encama civîna Wezîrên Karên Derve yê Dewletên Ewrûpayê bo Tirkiyeyê qewimîne nebaş bû. Li gorî biryarên ku hatine girtin, dewleta ku çekan ji Ewrûpayê dikire, ger îxtîmala şerê navxweyî li wî welatî hebe û ew welat van çekan ji bo zordariyê bi kar bîne, wê ew çekan nafirosîne wê dewletê. Di nav wan dewletan de dewleta Tirkiyeyê jî cihê xwe girt. Bi pey ragihandinan, Yekitiya Ewrûpayê wê di pêşerojê de helwesta xwe tûjtir bike. Hê şoka van yekan ji ser dewleta tirk neçûbû ku Yekitiya Ewrûpayê ji Tirkiyeyê hawirdeya (îthalata) berhemên behrê qedexê kir. Ev biryar ji aliyê Komîteya Weterînerên Komîsyona Yekitiya Ewrûpayê ve hate girtin. Komîte di 2 û 6'ê reşemiyê de ji bo lêgerîna berhemên behrê hatibû Tirkiyeyê. Xuya dike ku Tirkiye ji ber vî qedexekirinê wê ji aliyê aborî ve gelekî bitengije.

Di gel van yekan Instutiya William Pompe a li Hollandayê piştî encama lêkolîna der barê narkotîkê de gihîştê wê baweriyê ku karê narkotîkê ji aliyê dewletê ve tê organîzekirin. Lêkolîna ku ji aliyê peywirdarên Instutiya Yücel Yeşilgöz û Prof. Frank Bovenkerk hate kirin, di nav pirtûkekê de bi ser navê "Mafyaya Tirkiyeyê" berhev kirine. Li ser vî yekê Yeşilgöz û Bovenkerk civînek li dar xist. Di civînê de danasîna pirtûkê hate kirin. Li gorî daxuyaniyên wan, li Tirkiyeyê ranta ku ji narkotîkê tê pê, ji bûtçeya dewleta tirk a salane bêhtir e. Her wiha di heman demê de hatiye diyarkirin ku, ji 50 milyarê ku dewleta tirk bi dest dixê, 9 milyarê wê li lîçûnên şer diçe.

Li Kahîreyê civîna ereb û kurdan

Li paytexta Misirê Kahîreyê 27'ê meha gulanê civînek di navbera kurd û ereban de hate lidarxistin. Beramberî hemû hewlên Tirkiye û Iraqê yê li dijî jî, civîn ji aliyê Rêxistina Piştgiriyê ya Asya û Afrîkayê (AAOS) ve hate sazîkirin. Di civînê de bi giştî li ser yekîtiya Iraqê hate rawestandin. Tişteki balkêş, ji başûrê Kurdistanê bo civînê YNK û PDK hatin vexwendin, lê belê hêzên perçeyên din ji aliyê komîteya amadekar ve nehatine xwendin. Li gorî ragihandinan di civînê de venexwedina PKK'yê û rêxistinên ji Rojhilat û Başûrê Biçûk hatiye şermezarkirin û ev yek wekî nakokiyekê hatiye binavkirin. Ji aliyê din ve li gorî agahiyan Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî peyamek bo civînê şandiye. Lê hate gotin ku dewleta Misirê bi awayekî fermî bîpîrsiyariya vî civînê negirtiye ser xwe.

NAVENDA NÛÇEYAN

Kurtenûçe

Li gorî nûçeyekê Ajansa Anadolu-Luyê (A.A) roja 26'ê gulanê li çoltera Silopiya Şernexê firokeyeke artêşa tirk ketiye. Ajansê di nûçeya xwe de diyar kir ku firoke ji ber arîzayekê teknîkî ketiye. Di heman nûçeyê de hate daxuyandin ku leşkerê bi navê Mehmet Görmez, ku peywira xwe li Fermadariya Piyade ya 23 yan ya Silopiye pêk daniye, jiyana xwe ji dest daye, 3 subayên payebilind jî birîndar bûne. Her wiha hate ragihandin ku cendekê Mehmet Görmez li Rihayê hatiye binaxkirin.

HD'ê rapora îhlalên mafên mirovan a meha avrêlê ragihand. Li gorî vî raporê; 12 kes bi awayên fail-i mechûl hatine kuştin, 225 kes di şer de jiyana xwe ji dest dane, 4 kes hatine windakirin, 70 kesan îşkence dîtin, 5579 kes hatine binçavkirin, 117 kes hatine girtin, 8 kes di girtûgehan de hatine birîndar kirin, 1396 kes ji kar hatine avêtin, 8 rêxistinên girseyî û dezgehên weşanê hatine girtin, 34 sazî hatine dagirkirin, 22 weşan hatine qedexê û berhevkerin, ji bo dîtin û ramanan 230 sal û 4 meh cezayê hepsê hatiye xwestin.

Ji hêla Weqfa Çand û Hunerî ya Yılmaz Güney, Kovara Leman û hin hunermendan ve, ji bo ku filmê Y.Güneyê bi navê "Rê" (Yol) li Tirkiyeyê bê nîşandayin, qempanyayek hate dest pê kirin. Ji bo vî projeyê di rojen derbasbûyî de hunermendên bi navê Yılmaz Erdoğan, Aytaç Arman, Berhan Şimşek, Şerif Sezer û Melike Demirağ hatin cem hev. Hunermend Yılmaz Erdoğan da zanîn ku ji bo ku berhemên Y.Güney bînan parastin û filma ku Xelata Palmiyya Zêrîn li Cannesê wergirtiye, çî ji destê wî bê wê bike û 8.5 milyarî li vî projeyê xerc bike.

Cigirê Serokê Koma Partiya Fazîletê Lütfü Esengün, ji bo biryara dozvekirinê ya DGM'ê li hemberî MÜSIAD û serokê wê Erol Yaraş, reaksiyoneke tûj nîşan da û got diyê di zûtirîn katê de DGM bêne girtin. Esengün ragihand ku, DGM peywira xwe ya esasî bi cih nayîne û di cihê ku li cîniyetên fail-i mechûl bikole û pîrsa Susurlukê çareser bike, rê li ber dîtin û ramanan digire. Her wiha Esengün da zanîn ku, li Tirkiyeyê pest û kotekî li ser dar e û demokrasî û hiqûq binax bûye.



vekirin: "Gerîla li her derê ye û ne li derê ye." Dîsa Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan jî da zanîn ku heke gerîla li gorî amadekariyên xwe bersivê bide dagirkeran, dibe ku ew tevgera dagirkeriya bibe ya dawî.

Li gorî ragihandinan, her wekî operasyonên berê di vî operasyona dawî de jî, dewleta tirk li herêmê ketiye tengasiyê. Ji gerîlayan li ser hev derbeyên xedar dixwe. Li gelek herêmên li ser sînor de û li başûrê Kurdistanê leşkerên tirk ketine kemîna gerîlayan.

Ev êrîşa dagirker a artêşa tirk, di qada navneteweyî de jî bû sedema reaksiyonan. Bi taybetî dewletên ereb, ew operasyon wekî karekî li derveyî zagonên navneteweyî hate nixandî û hate şermezarkirin.

Li aliyê din gelê kurd jî bi çalakîyên cur bi cur ev êrîş protestoyê, Brukselê rewşên bîrên kurd çalakîyek li dar xist. Dîsa dîlên PKK'yî ji bo protestoyê greva birçîbûnê dane destpêkirin. Her wiha ERNK

daxuyaniyên kesên ku hatine girtin, wê Serokê HADEP'a Stenbolê Mahmut Şakar jî bihata kuştin. Her wiha di nav wê planê de êrîşeke li ser navçeya Sarigaziyê ya HADEP'ê jî hebûye. Li gorî agahiyan ku endamên çeteyê dane Emniyetê, li kampa Silivriyê 15 kes di warî leşkerî û siyasî de hatine perwerdekirin. Her wiha bi pey dazanînan, wan tatbîqatên xwe yê leşkerî li ser wêneyên Akin Birdal pêk anîne. Ji wan 15 kesan heta niha 3 kes hatine girtin. Ji bilî her sê endamên çeteyê tu kesên din tune ne. Li ser vî yekê raya giştî reaksiyona xwe li dijî negirtina endamên çeteyê yê din gur kir û hate daxuyandin ku, ev yek nîşaneyê berdevwama çalakîyan e. Her wiha ji aliyê HADEP'ê ve jî hate ragihandin ku partiya wan ligel girtina wan kesan jî dîsa hedef hatiye nîşandayin. Armanca wan meşrûkirina erîşên kirêt e. Rayedarên HADEP'a Sarigazi dan zanîn ku sedemeke neqandina wê derê ew e ku Sarigazi di bin kontrola jandarmayan de ye.

Çîroka me û mala Berzanî

Sala 1969 e, ez hîna 12-13 salî me. Ji bo perwerdehiyê cara yekemîn e ez ji malbatê veqetiyame, ketime nav civakeke ji min re xerîb. Ew civat jî li gorî wê demê zanyar tê hesibandin. Cara yekemîn bû ku min di wê civakê de navên kurd û Kurdistan bihîst û gelek li min eser da (bandor kir). Gava ku min navê kurd û Kurdistanê bihîst, bi wan re navê M. Mistefa Berzanî ket hiş û mêjiyê min. Ez dikarim bibêjim ku ev her sê nav li cem min bi hev re bûbûn yek. Belkî yê ku zêde li min bandor kiribû navê Mela Mistefa Berzanî bû. Hûnê bibêjin çima hezkirina serokekî ji hezkirina welêt zêdetir e? Gelek sedemên wê hene, belkî ji ber ku em civakeke feodal û eşîrî ne, belê gelek sedemên dîtîr jî hene. Lê ez zêde dirêj nakim, ev taybetiyeke gelê kurd e. Ev rewş, ne rewşa min bi tenê bû, ez bawer im ji sedî notê welatparêzên wê demê wekî min bûn. Yanî tevên wan Mela Mistefa Berzanî dipesinîn. Ew jî bo Berzanî û mala Berzanî dua dikirin, piştî ji welêt re dikirin. Ew hezkirina Berzanî û pêşmergeyan di dilê me de şax dabû. Li ser vî tiştî bûyerek di serê min re derbas bûbû, ez dixwazim li vir çêlî wê bûyerê bikim.

Apekî min î mêtîzîngarî, pir otorîter, keyayê Gund hebû. Ne mezin, ne jî biçûk kesî newêribû li ber xeber bide. Ez jî 15 salî me. Rojê di civatê de ji bo Mela Mistefa Berzanî gotineke nelirê pêkanî Ez gelek pê êşiyam û min nimerdî nekir, di cih de min ew gotin ji bo Serok-

cumhurê dewletê li wî vegeand. Hemû civat şok bû ku min çawa ew gotin li mirovê rihspî otorîter vegeand. Ew jî ji ber ku texmîn û hêviya tişteki wisa nedikir seqizî. Çend gotin kirin (Zarokên duh rabûne şetexeliyên mezin dikan, hîn serê te di nav guwê te de ye, ez rabim ez ê nizanim çî bi te bikim). Belê min jî hinek bersiv dan. Ez bawer im ku hînga wî gotin û şetexeli ji Xwedê û pexember re (ku me pir ji wan hez dikir) bikira jî ne min, ne jî yekî dîtîr nikaribû bersiva wî mirovî bide. Ez van tiştan ji bo çî dibêjim? Ez dixwazim radeya hezkirina xwe ya ji Berzanî û malbata wî re bidim famkirin. Yeke din jî ez bibêjim.

Di wan salan de wêne pir kêm bûn. Yekî me bibihîsta wêneyê Berzanî li cem heye, me dikaribû qonaxa deh rojan here da ku wî wêneyî bibîne. Jixwe pir jî qedexe bû. Wêneyekî Berzanî wekî eron û cebilxane bi xetere bû. Wêneyê wî dixistin nav hezar kincik û potikan û dixistin hezar qulî.

Dema şerê wan û Baasê di sala 1974'an de dest pê kir, rojnameya Hürriyetê her roj li ser wan nivîs derdixistin û wêneyê Berzanî yê rengîn diweşand. Me nikaribû bixwenda jî mê dikir. Dîsa di wê demê de di civateke pir fermî de (ku şêx, mele hinek axa jî di nav de hebûn) zilamekî sofi û pir gotineke nelirê jî bo Berzanî gotibû. Çiqas li gorî urf û adet û rewşa minî wê demê bîdebî jî dihat, dîsa min şûrê Berzanî kişand û min gotina sofi lê vegeand. Hem jî ber-



temenê minî biçûk û hin sedemên dîtîr nelirê bû ku min gotin li wî mirovê kal vegeand, lê hezkirina Berzanî ez neda-me sekinandin ku guhê xwe bigirim.

Ma nayê bîra kê ku hemû kilam, qasîde, dilok û diruşmeyên me li ser Berzanî û pêşmergeyan bûn?

Kilama "Ha pêşmerge bavê min/Lêxin her du çavên min" kê nedigot? Hevalekî me hebû, hîn li jiyane ye ez navê wî nabêjim. Gotineke wî hebû, her û her dubare dikir, digot: "Berzanî pexemberê min e." Ma qey diqedin tiştên ku me ji bo Berzanî û malbata wî kirine? Ez bawer im ên ku min kirine, yê herî biçûk in. Lê şandina barê hestira (ji pêlavan, ji genim, ji nok û nîskan) bi rebenî û belengazî jî mele û rihspiyên me ji wan re dişandin. Ma lazim dike tevî bibêjim? Kê nebihîst? Qey gelo me kê nedîr duh

ku jin û mêr û zarokên wan xwe li me girtin, hatin Mûşê, Mêrdînê û Amedê gel ji wan re çî nekir? Ma divê ez tevî bibêjim?

De îcar werin li vê paradoksê temaşe bikin. Îro jî kurê Berzanî û pêşmergeyên wî wan ewziya vedigerfîn. Spasiya xwe pêşkêşî me dikan! Me li ser ser û çavên xwe datînin(!)

De gelo em li halê xwe bigirin an bikenin? De gelo emê giliyên xwe ji kê re bikin, emê derd û kulên xwe ji kê re bibêjin. Emê vê serbilindî, merdî û şerêfa! mala Berzanî ji kê re bibêjin?!

Na dostino na! Em ji tu kesî re nabêjin, emê tenê ji dîroka xwe re bibêjin. Emê kevîran têxin paşîla xwe, emê dewsa gulê Berzanî û pêşmergeyên wî bikin şana salê, bila ji bîra me neçe.

Q. DÊRSILAVÎ

Serincêkî rêzimanî

EHMED QAZÎ

Eger çî zibaniş wek her diyardeyekî zindî hemûkan pêdawistî be niwê-bûnawe heye û debê de gel xul û sûrî zeman rêk bikewê û eweş bimanewê û nemanewê dariştin û dataşin û dahênan û dananî wişe destewaje rêkewendî taze dênête gorê, belam ewe ne bew manaye ye ke le xomanewê her wişeyekî wîsman bixene naw ziban û herçonikê wîsman dekarî bikeyn.

Helo "Qasim Mu'eydzade" şairî be naw û bang le şêrêk da ke le jimarêy 139'i Sirwe da bilawî kirdotewe (lapere 40) delê:

Xeyalî rexşekî firinde ye *Detrifênê be rewnedîw*

Wajey "firinde" bêtuman le ber wajey "pirinde" y farisî gîrawetewe. Yanî şair gotûyetî farisî da le çawki "pirîndin" biker (faîl) "pirinde" saz deken, deyca ba êmeş le "firîndin" firinde saz bikeyn! Be taybet ke le çawgi "dirîndin" "dirinde" şman heye.

Bonî em nimûneye be hîç kolicêk

bem manaye niye ke le her çawgêk bem şeweye "biker" dirust bikeyn, wek hêndê le xoşewîstani tiriş car û car, "kuşinde, xulqinde û nûsinde" û şifî wayan dekar hênawe. Ême le ziban da meqûley "qiyas" û "sema" r' man heye.

"Qiyas" ewe ye ke le ser qiyasî rêziman û qaîde û qanûn waje dabirêjin. Wek de kurdî da bo dirustkirdinî biker (faîl) qaîde ewe ye ke nişaney /-er/ de-xeyne ser biney dahatî (bin mizar)"î çawg. "Nûser, xwêner, niwêner-têkder, hander, xulqêner û ..."

"Sema" r' Ewe ye, formêk (herçî bê) çon debîsî her awaş dekarî bikey û mafî ewe şit niye le ser new forme nimûney dikey dabirêjî. Eger debîni le "dirîndin" rinde saz kirawe. Mafî ewet niye le "kirîndin" r' "kirinde" û le "dizîndin" r' "dizinde" saz bikey, ba eweş wa bîr bixeynewe ke "dirinde" tenya bo kuştin û heldirîni zîndewer dekar dekrê û bew canewerane delên ke raw deken û goştxor in, dena kesêk kiras ya ke wa bidrê pîy nalên "dirinde".

Lêre da reng e ew pirsiyare bête gorî ke hêndêk çawg hawar deken ke natiwa-

nin paşgîrî /-er/ be xoyanewe bilkênin wek çinin, jenîn (lêdanî amrazî mosîqanî) kirdin.

Rînen, birdin, birîn helkêndin, kuştin û...

Bo em core çawgane zortir debê gorê helxeyn "Sema" r' bizanî xelkî asayî çî delên. Ewey aşkira ye bikerî em çawgane bem core saz dekrê ke nawî berkârî (mef'ûl) degel biney dahatî çawg dekar dekeyn, wek:

Çawg (mesder) Biker (faîl)

Çinin: Gulçin, bijarçin, mazûçin, qa-licîn...

Jenîn: Bilwêrjen, zurnajen, şimşaljen...

Kirdin: Karkir (bo ciwanî bote karker), nanker, deweker...

Rinîn: Baxrin, gulrin, bêstanrin...

Birdin: Barbir (bo ciwanî bote barber), dilber, malber...

Birîn: Babir - cergbir, gurçikbir, destbir (desbir)

Helkêndin: Bîrhelken, çalawhelken - cogehelken, serhilken, (xogehelken)

Kuştin: Piyawkuj, mirokuj, gakuj.

Le kotayî de pêwîst e bêjin ke amraz û şewey dariştinî biker (faîl) le kurdî da gelêk zor û zewend e û heldegrê deyan laperey bo terxan bikey û pêwîst be we naka le nişane û elametî erebî û farisî kelk werbigrî.

/U/ le kurdî da

"U" wajey pêwendî û likêner e. De zibanî kurdî da dekewete nêwan dû nawa, dû cênaw, dû riste û... Şewênûsînî bem core ye "u". Çun bo xoy serbexo ye û amrazekî rêzimanî ye baştir wa ye be tanya binûsrê, wek:

Hesen û Emîr Amozan.

(Hesenû Emîr...hele ye)

Hêndêk le nûseran denûsin "we". Em forme le kurdî de niye û zortir ewaney erebî ya farisî dezanî tûsî em heleye debin. De kurdî da em nişane hemû kat dexweendîretewe "u" wek le wajey kurt ya kurdî da.

Min u demawend şarîtkman besten

Ew tem u min xem ta we roy merden.

Le zibanî inglîzî da "and" û le zibanî almanî da "und" û le feranse da "et" dekar dekrê. Le zibanî erebî da delê "wa".

Hêndêk le nûseran be taybet ewaney ke bo melayetî xwêndûyanê le nûsrawekaniyan da "w-a'y" erebî dekar deken ke dirust niye û degel rohî zibanî kurdî yek nagirêtewe. Diyar e le şê'r da be lasayî kirdenewey edebiyatî inglîzî ya zibane-kaniî dike ewe kirawe. Belam le pexşan da ew kare na durist e.

Le zarawey herawî kurdî şemal da hemû kat her "u" dekar dekrê.

Hesen u Emîr pismam in.

Govarî Sirwe, jimarêy 140, lapere: 44-45, wergêr bo pîti latîni Samî Berbang

Rêzimanê kurmançî

- Wane 13 -

SAMÎ BERBANG

Di vî warî de tiştêkî din ku pêwîst e li ser were rawestandî jî, çewtiya bikaranîna hin lêkerên hevedudanî ne ku bi alîkariya wan hate pê.

Bo nimûne:
Destpêkirin, têhilatin, têfirandin, têgihîştin, têderxistin, pêketin, pêxistin, serjêkirin, jêbirin, pênivîsîn, lînivîsîn, lêtemaşekirin, jêçûyîn, pêrabûn, pêşabûn, têgerîn, lêketin, lêkirin û hwd.

Her wekî diyar e, ev lêker ji çend hemanan pêk hatine. Heke mirov wekî nimûne lêkera destpêkirin dahûrine, dê bê dîtî ku ji navdêra "dest", ji daçeka "bi" ji cînavka "wî/wê" û ji lêkera "kirin" pêk hatiye. Ew lêkerên li jor giş ji çend hemanan pêk hatine û mirov dikare wan jî wekî destpêkirinê dahûrine.

Dema ev cure lêker tene bikaranîn, bi berdewamî çewtiyek tê kirin. Ji bo rê li ber vê çewtiyê bê girtin, divê neyê jibirîkirin ku, di wan lêkeran de cînavkên li hev xistî cihê navdêrêkê digire. Lewre ew bi tu awayî nikarin tevî navdêrê bê bikaranîn.

Ji bo sayîkirina mijarê mirov dikare vegere ser minakên li jor.

Dema me navdêra "kar" xist cihê

"pê" ya destpêkirinê, cînavkên wî/wê jî holê radibe û daçeka "bi" jî vedigere dirûvê xwe yê resen.

Lewre mirov nikare bibêje: "Min dest pê kar kir", divê mirov bibêje: "Min dest bi kar kir."

Bi heman şeweyî hevokên bi şeweyê:
Min pê qelemê nivîsî

Min lê televîzyonê temaşê kir.
Ez tê Elî gihîştim û hwd.

Çewt in û şeweyê rast wiha ye:
Min bi qelemê nivîsî.

Min li televîzyonê temaşê kir.
Ez di Elî gihîştim.

Ji bilî cînavkên "wî/wê" ev daçekên navborî dikevin ber cînavkên berbihevî "êk" û "hev" jî. Cînavkên lihevîstî yê ku bi vî awayî tene pê jî ev in:

Ji û hev dibe jev
Bi û hev dibê pev
Li û hev dibe lev
Di û hev dibe tev
û

Ji û êk dibe jêk
Bi û êk dibe pêk
Li û êk dibe lêk
Di û êk dibe têk

Bi alîkariya van cînavkan hinek lêkerên hevedudanî pêk hatine. Wekî;
Pêkhatin, têkçûn, lêkdan, jêkbûn,

pevçûn, pevixistin, tevgerîn, jevketin, lêkxistin, têkbirin û hwd. Hinek ji wan cînavkan wekî yê din bi hêsanî jî hev nan bin yanê wekî çawa mirov dikare bi 'ew her du mirov têkçûn, tevçûn, pêk ketin' mirov nikare bibêje; "ew her du mirov di êk yan jî di hev çûn, bi êk ketin" lewre ew lêkerên biwêjî ne û wateyê nû li wan bar bûye. Lê di cihê "pevketin" de mirov dikare bibêje; "Ew mirov bi hev ketin."

Cînavkên şanîdanê

Ev cure cînavk, tiştêkî nîşanî mirov didin. Wate cînavk tiştêkî jî aliyê dûr û nêzîkiyê ve diyar dikin. Xaleke balkêş jî ev e ku di kurmançî de, cînavkên şanîdanê yên bi /v/ yê cihê nêzîk, ên bi /w/ yê jî tiştê li dûr pêşberî mirov dikin. Cînavên şanîdanê mîna, yên kesane du cure ne; yên xwerû yên tewandî.

Cînavkên şanîdanê yên xwerû

Ev cînavk du heb in, her wekî li jor jî hate gotin, tiştê ku tê şanîdanê li gorî dûrî û nêzîkiyê jî hev cuda dikin. Cînavkê ku dikeve dewsa tiştê nêzîk "ev" e, yê ku tiştê dûr dinimîne jî, "ew" e.

Cînavkên xwerû jî hêla zayendê ve nêtar in, yekjimarî û pirjimarî wan jî cî-

navkên pêrebestî diyar dibe.

Dema mirov bibêje: "Ev baş e", tê zanîn ku ev tişt, yekjimar e û nêzîk e. Dema yek bibêje: "Ev baş in", wê çaxê tiştên ku tê şanîdanê nêzîk e, lê pirjimar e. Ev cînavk di zaravayê kurmançiyê jêrî (sorani) de "em" e. Di hin devokan de jî "im" tê bikaranîn. Vê formê wekî pêşgir (pêrkî) jî di zimên de cih girtiye. Di sorani de imroj, emroj (di sorani û kirmançî de), di kurmançî de bûye îroj, îsal. Xuya ye ku /em-/, /im û /i-/ cihê /ev/ a kurmançî girtine.

Cînavkên şanîdanê yên tewandî

Her wekî berê jî hatibû gotin, cînavkên tewangbar in û wekî navdêran ditewin. Li vir cînavkên me yên şanîdanî "Ev û ew" jî ditewin û li gorî zayenda û mêjera xwe hin qertafan digirin.

Ev dibe; evî (nêr/nêzîk), evê (mê/nêzîk), evan (pirjimar/nêzîk). Ew jî dibe; ewî (nêr/dûr), ewê (mê/dûr), ewan (pirjimar/dûr). Piştî jî /e/ ya destpêkê dikeve, ew dibin; vî, vê, van û wî, wê, wan.

Minakên ji bo cînavkên şanîdanê:

Ev ji mal hat/ ew ji mal hat/ ev ji gund tî/ ew ji ba hevalan tî/ ev silavê dide/ ew nîn didin. Ev şivê dixwe./ Ew kincan dişon./ Ev mala xwe dikişînin.

Vî mala xwe bar kir./ Vê kinc şûştin./ Van ji me stranek re got./ wî nan xwar./ Wê dûwar lêkir./ Wan kir.

Rewşenbîrî û kurdayetî

NEJDET BULDAN



Di van rojan de li Ewrûpayê pir gotûbêj li ser rewşenbîriyê çêdibin. Hinek kes rewşenbîriyê bi welatparêziyê ve girêdidin. Hinek jî di bêjin, rewşenbîrî karekî akademîk e. Pêwîst e ku tevî siyasê nebin. Kurtiya we her kesek li gorî zanîna xwe şrove dike. Bêqirêj û niyetên xirab. Hinek kes jî bi rewşa xwe ve bi berjewendiyên xwe girêdidin. Pêwîst nîn e ku em li ser bisekinin, rewşenbîrî tê çi wateyê.

Belê pêwîst e ku mirov rewşenbîriya xwedî dewleteke cuda bibîn. Em ne xudan dewlet in. Ya herî girîng jî ew e ku rewşenbîriya kurdan bi piranî li derveyê welêt pêk hatiye. Wekî Bedirxaniyan. (Divê xetê tegehistin çenebit. Em nabêjin ku di welêt de rewşenbîrî çinînin). Gotina me li derveyê welêt e.

Wexta ku mirov xwedî dewlet bîtin, rewşenbîrî cûda ye. Welatê mirov bindest bîtin û tekoşîneke jî bo azadîyê hebit, rewşenbîriyê jî taybetiyên xwe hene. Mirovên zana, mirovên xwe zanyar dihesibînin, barê wan

giranîr e. Eger zanyarî jî bo pêşveçûna milletê mirov bîtin, dibîte zanyarî.

Heke welatê mirov tê şewitandin, dilê mirovî neşewitîn.

Ger di nijadkujiya li ser gelê mirov de, mirov her kuştînekê jî dilê xwe de nepejirîn, Eger di koçberiya gelê xwe de, mirov jî dil koçber nebî,

Heke di serhildanan de, mêjiyê mirovê jî serhildanan neket,

Ger di çalakîyên welat azadîkirinê de, mirov jî dil de nava wê çalakîyê nebin, ew ne rewşenbîrî ye

Kesên bi girtiye xwe ve girêdayî nebîn, di mêjiyê xwe de jî azad nînin e.

Pêwîst e dema welatê mirov tê şewitandin, kezêba mirov jî bişewitî.

Kurtiya wê, xwîna li welatê rîjandin, ji dilê mirov jî nerijîşt mirov nabîte welatparêz. Zanyar an jî rewşenbîr welatparêz nebîtin, ne rewşenbîr e. Zanyar jî nîn e.

Pêwîst nîn e ku mirov sed bi partiyekê ve girêdayî bîtin. Pêwîst e ku mirov bi welatê xwe ve girêdayî bîtin. Merc, rewş û nîrxên welat biparêzîtin.

Zanyarî derî vekirine jî bo gel. Pace ye. Rohanî ye.

Piranî jî bo kesên xwe li Ewrûpayê zanyar dizanin, ez dibêjim. Hinek kes hene ku, dehan sal in li Ewrûpayê koçber in. Sedema koçberiya wan jî ramanên wan yên siyasî ne. Çend sal in, li welatên xerîbiyê siyasê meşandine. Li dijî dewleta

tirk. Li dijî tevkuji û asimilasyonê. Li dijî nijadkuştina gelê kurd. Siyasetmedar in û xwedî raman in. Gelekan jî wan jî berpirsyariya partîyan kirine an jî jî bo pêşveçûna kultura kurdî xebat kirine. Pirtûk nivîsîne. Konferans pêk anîne. Bi hezaran kes jî ber raman û xebatê wan bûne welatparêz. Bi sedan kes jî li ser wan bîr û bawerîyan bûne şervan. Şehîd bûne. Birîndar bûne, bûne gazî. Ji malbatên wan jî şoreşvan û şervan derkeftine. Ji ber raman û ajîtasyonên wan, gelek kes di welatê xwe de îşkence û rezalet dîtine.

Niha em dizanin û pê agahdar dibin ku rewşenbîrî(!) me diçine eskeriya tirkan. Gelo çima? Eşkere ye ku ew mirovine hosa (wisa) difikirin:

"Min di nava gelê kurd de, navek jî bo xwe çêkir. Ez hatim naskirin. Eger ez navbera xwe û dewletê jî xweş bikem, jî bo wan eskeriyê bikem, rojê pêşiya ez dikarim siyasetekê li Tirkîyê jî bimeşînim. Û di hilbijartinan de dikarim bibim berendam. Kurdên welatparêz ê dengên xwe bidin min. Ez ê jî bibim nûnerê wan."

Ji bo dewleta tirk jî baş e. Çend kurdan bidizîtin kar e.

Gelo qey kurd dîn bûne? Dê çawa nîrxên xwe yên bilînd bi destê te gemarî biken? Ma wisa hêsanî e destûra te bidin? Bi kurî gotineke herêmi heye:

"Xwêlî ser. Cihê şêran, rovi lê naxên gêran."

Deyndarî û şehîd

**Em bi nîrxên şoreşê
xwe têr dikin lê em
tahdeyê nadin xwe.**

**Sedema vê hel-
westê, xebata xwe
têr dîtine.**

**Lê şehîdan dema
xwîdan, ked, emel,
tecrûba xwe dan pê
têr nebûn.**

**Canê xwe dan
bi wê jî têr nebûn.**

**Keça kurd ya
qehreman Zilan
wiha dibêje: "Xwezî
ji canê min bêhtir
tiştêkî min hebûya,
ku min bidaya." Di
vir de hew gotin
ango bes dîtin tune
ye.**



Jiyan, bi təkiliya mirovan, danûstandina şexsî û civakî dimeşe. Şexs û civak bêyî hev nabin. Ango perçeyekî heman laşî ne; şexs tune be civak, civak tune be şexs nabe. Hin şexse jî tariya civakê der tèn û jê re dibin ronahî. Riya rizgariyê nîşanî civakê didin. Rizgarî, ne rihet e, dijwar û bi cefa ye. Lê dawî, bi rûmet e. Rûmet, serxwebûn û azadî ye. Azadî bi xebat û lebatê gengaz e. Yên ku doza azadiyê dikin, rûmetê didin civakê. Ev kesên bi rengî, civakê dikin xwedî ziman, çand, hêz, siyaset, azadî ... hwd. Nîrxên neteweyî ava dikin. Ji ber vê yekê ev kes, hemû derfet û hebûna xwe fedayî gel dikin. Gel bi vê yekê jî wan re deyndar e.

Deyn; dayina madî-manewî ya bi bedel e.

Deyn; di nava gel de bi şiva mirov tê nîrxandin. Yê girêdayî deyn be, jê re xwedî soz tê gotin.

Nedayîna deyn, wekî nemerdî, bêasazi û bêbextî tê binavkirin. Ev yek qedir û qîmetê dixîne.

Kesên ku xwedî deyn û xwedîtîyê li deynê xwe dikin, ew kesên birûmet û serfiraz in. Yê wan dike xwediyê nîrxên mirovahî, berpirsiyariya li hemberî mirovahî û civakê ye.

Deyn şiva meşê ye. Di şoreşê de deyn ne tenê danûstandina madî ye. Piranî manewî ango ruhanî ye. Ji ber vê yekê xebat û lebateke dilsoz û lehengiyeke xurt dixwaze. Lehengî, bi girêdana mafê gel, hezkirina axa welêt, bi birdozî û bi xwedî derketina gotinê mimkûn e.

Ji bo xwedî derketina li deyn, ne hewce ye em gelekî dûr herin. Lê pêwîst e, em bifikirin û li dora xwe binihêrin. Gelo wê mirov çî bibîne? Bi hezaran gund û bajarên wêrankirî û şewitî, bi deh hezaran şehîd, zarkên gulebarankirî, laşên bêserî, seriyên bêlaş, -laşên gurandî, bedenên berik di can de vekirî, laşên parçe parçekirî... şewitandî jî wan pêştir.

Wan şehîdan jî bo me, xwe fedakir û canê xwe da. Ji bo ku şerefê, namûs û serfiraziyê bidin civaka

kurd. Ji me re bûn rihê berxwedanê. Lê ev fedekarî jî têr nedîtin. Şehîde nemir M. Hayrî Durmuş wiha dibêje: "Heke ez mirim li ser kêla tirba min deyndar binivîsin." Belê. Şoreşger, leheng û canfedakî wiha jîr, zana û birûmet, piştî hew qas xebat û xizmeta bo şoreşê wiha bibêje, pêwîst e em tev rewşa xwe jî nuh ve bidin ber çavên xwe. "Ez kî me, çî me? Çî dikim? Pêwîst e çî bikim? Ji min çî tê xwestin? Dikarin deynê xwe bi çî awayî bidim gel, Welêt, şehîdan û Partiyê?"

Dîsa em çî dikin an jî bi çî awayî dibin bersiv. Nêzîktêdayin çî ye? Em bi nîrxên şoreşê xwe têr dikin lê em tahdeyê nadin xwe. Sedema vê helwestê, xebata xwe têr dîtin e. Lê şehîdan dema xwîdan, ked, emel, tecrûba xwe dan pê têr nebûn. Canê xwe dan bi wê jî têr nebûn. Keça kurd ya qehreman Zilan wiha dibêje: "Xwezî ji canê min bêhtir tiştêkî min hebûya, ku min bidaya." Di vir de hew gotin ango bes dîtin tune ye. Heta hetayê sêdeqeta bo soz û deyn

heye. Ango dizane ku bes dîtin, çalakkariya mirov tək dibe û li pêşiya jiyan û serkeftinê dibe asteng.

Gelo ka em bifikirin. Me xwe wiha, heta hetayê bi fikir û raman, jî dil û can, bi hucre û xebata xwe, bi şehîd û partiya şehîd, bi daxwazî û armanca şehîdan ve girêdaye? Ez an jî em xwe çiqas didin şoreşê? Pêwîst e mirov jî şehîdan hînî dersa jiyanê bibibe. Ango dema şehîdan xwe fedayî gel, welat, serxwebûn û azadiyê kirin, di fedekarî de tu xişûşû nekir. Tu daxwazên madî û mafê şexsî nekirin hincet.

Belê. Doza wan bes ev bû: Mafê çarenûsiyê, azadiya Kurdistanê û wekhevî.

Şehîd wekî stêra zuhal rê nîşan didin ku, ji bo azadiyê pêwîstî bi raman, rih, can, mal, beden û tevayî derfetan heye. Emilandin, kûrbûna li ser şoreş û wateya sereke ye. Xebata li ser çareserkirina pîrsgirêk û rêxistinî ye.

Ji bo vê yekê êşandina dil, mêjî, serî, ziman, hwd. lazim e. Dibêje: mêjî, dil, dest, pênûs, çav ziman, gav... çek fêhm û feraset, madî-manewî hemû heyin heya dawiyê di xizmeta gel û şoreşê de be.

Ango kurd hemû deyndarê şehîdan, Kurdistan û têkoşîna azadiyê ne.

Em jî vê axê re ku me li ser çavê xwe vekirî deyndar in. Axa em li ser vê axê listin, mezin bûn. Ew civaka ku em tê de ghiştin, em bi her tiştê xwe deyndarê e ne. Deyndarên zarkên Kurdistanê ne.

Ji ber vê yekê, girîng e Kurdistanî; kî li ku dibe bila bibibe, pêwîst e xwe li gorî şer saz bike. Li gorî pêşketin û pîrsgirêkên şer xwe berpirsiyar bibîne, da ku bibibe bersiv. Serokê Neteweyî derheqê deyndariyê de, li ser nîrxandina M. Xeyrî wisa dimixîne; "... Di eslê xwe de kêmasiya rêxistinî, deyndarî ye. Tevahiya xizûsiyetên şoreşê rasterast deynek e! Ji ber ku min ev hemû nedîtin suçdar im" Wê hingê pêwîst e wasiyeta şehîdan bê cih. Deynê neteweyî; pêkanîna hevî, daxwaz û armancên bo azadiyê ne. Ji bo vê jî rêxistin, têkoşîn, şoreş û serfiraziyê jî tiştêkî re rê nayê hiştin. Ev serkeftin e; mizgîna azadiyê ye. Serkeftin di destê me de, bi vîn di mal û karxaneyê de, di dil û mêjî de ye.

Di vî warî de çiqas serkeftin û rêxistîbûn hebe, ewqas jî deyn hatiye dayin. Lê, dawî bi serxwebûn û azadî ye.

AHMET ÎVRENDÎ / BARTIN

□ 4 pûşper 1988:

M. Latif Yıldırım (Delîl) şehîd ket

Gerîlayê Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê ARGK'ê M. Latif Yıldırım (Delîl) di şerekî ku li herêma Omerî (Mehsertê), li navbera gundên Cibilgiravê û Talatê qewimî de, şehîd ket. M. Latif Yıldırım di sala 1942'yan de li gundê Çalê ya ku bi ser Mehsertê ve ye hatibû dinê û di sala 1984'an de ketibû nav refên ARGK'ê bûbû.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 2 pûşper 1991:

Ahmed Arif çû ser dilovaniya xwe

Helbestvan Ahmed Arif di 65 saliya xwe de li Stenbolê çû ser dilovaniya xwe. Ahmed Arif li Diyarbekirê ji dayik bû. Hêj di dema ku li Enqereyê di Fakulteya Ziman, Dîrok û Cografayê de dixwend, ji ber bîr û baweriyên xwe yê siyasî du caran kete hepsê. Ji ber vê yekê xwendina xwe niwco hişt û di hin rojnameyan de xebitî. Ahmed Arif, tevahiya helbestên xwe di pirtûka bi navê "Ji hesreta te min qeyd kevn kirin/ Hasretinden Prangalar Eskittim" de gihande ser hev.

Pêşangeha wênesaz Ahmet Benli: Dîmenin ji jiyane

Wêne di jiyana mirovan de, cihekî gelekî taybet digire. Wêne, xewn û xeyalên mirovan, pêdivî û armancên mirovan li ser xwe dicivîne û navgêrî hinekên din dike. Her wiha biyanistan û jiyana kesên jî, ji nivîskar û siyasatmedaran baştir û zelaltir bi wêneyan tê nasîn. Di vir de rola wênesaz ji girîng e. Wênesaz çiqas jiyane baş binase, wê berhemên ew qas baş û têrnavok biafirîne.

Roja 8'ê gulanê li Navenda Çanda Mezopotamîyê NÇM'ê, bi ser navê "Dîmenin ji jiyane /Yaşamdan Kesitler" ji aliyê wênesazê kurd Ahmet Benli ve pêşangehek hate lidarxistin. Naveroka pêşangehê pir alî ye. Mijar li ser tiştê bi tenê ye lê belê di nav wê mijarê de gelek dîmenên cihêreng hene. Di nav berhemên wênesaz Ahmet Benli de, wêneyekî ku ji roja dayikbûnê û hetanî roja îroyîn şîrove dike, balê dikişîne. Ji aliyê din ve hin dîmenên ji Kurdista-




nê û jiyana kesên serxweş yê li metropolan dîsa avahiyên kevin yê li Amedê. Keçikên di nav rengên kes û sor û zer ku di govendê de bi milê hev girtî ne û dîsa li Kurdistanê pira di navbera Batman û Amedê de "Pira deh nig" ji nav wêneyan leqayî çavê me dibe. Ji "Mardîn Kapî" jî, sembola nargîleyê ku kalên Kurdistanî li hev dicivin û nargîleyê dikufkufinin nehatiye jibîrkirin. Lê ne wekî em dibêjin. Bes kalek di wêne de dixuye. Ji koçberiya kurdan jî çend wêne di pêşangehê de hatine bicihkirin. Bi kurtasî ji jiyana kurdan bigirin hetanî adet û toreyên wan, tevî bêrîvaniya wan di

tabloyên Wênesaz Ahmet Benli de tîn dîtin.

Wênesaz Ahmet Benli bi tevahî li ser bûyerên rastîn rawestiyaye. Jixwe ew jî xwe wekî wênesazekî realist bi nav dike. Hemû wêneyên ku çêkirine wî bi xwe kişandine. Wênesaz Benli, tiştên ku jiyane kişandine ser tabloyan. Benli diyar dike ku, ew ji berdelan xwe nade alî. Ji bo ku ew li ser vê axê azad bi-jî, ew dê bi çêkirina wêneyan têkoşîna xwe bidomîne.

Wekî her tiştî ey pêşangeh jî bêkêmasî nîn e. Di pêşangehê de jan bi ser her tiştî ketiye. Coşa gel baş nayê xuyan. Dema Wênesaz ango nivîskarek her du xalên girîng di nav hev de nehone û navgêrî gel neke, nikare ji nav jiyane berhemên rasteqîn biafirîne. Bêguman ji ber kêmbûna wênesazên kurd gengaz e ku ji hin aliyên ve kêmasî jî xwe bidin der. Azadî jî di wêneyan de baş nehatiye formûlekirin. Lê belê li gel hemû serketin û kêmasiyan pêşangehên bi vî rengî hem bala gel dikişîne, hem jî çanda wênesaziyê bi pêş dixê.

AZAD AVAŞIN

ÇAVDÊRÎ**AVAŞIN****SERKAN BRÛSK**

Berî vê bi du salan dema hevalan behsa deranîna kovareke xwerû bi kurdî kiribû û ji min xwestibûn ku ez alîkariya wan bikim, min bi kêfxweşî, ev daxwaza hevalan qebûl kiribû. Berî vê daxwazê ne bi gelekî bû ku min biryara nivîsandina bi kurdî dabû. Jixwe min jî bo Med-TV çend film wergerandibûn. Di ber re jî min hewl dida xwe ez bi kurdî helbest û çîrokan binivîsim. Lê min dizanibû ku hîn ji min re pir divê. Ji ber ku min jî wekî hemû kurdên li Bakur hîndekariya xwe bi tirkî kiribû.

Tam di wê dema ku ez li kurdî sor bûme û min biryara xwe daye ku, ez dê bi kurdî binivîsim û heta min hinek rûpel bi nivîsandina kurdî dagirtine. Mesela deranîna kovara Avaşinê ji aliyê hevalan bi heyecaneke mezin û dilxwaziyê fireh ji min re hatibû gotin. Hevalê ku ji bo deranîna kovare hewl dida, dîsketa xwe deranîbû û forma kovare pêşkêşî me kiribû. Bi kêf gotibû ku navê wê dê bibe Avaşin. Çîroka navlêkirina wê jî wiha vegotibû: "Avaşin navê çemekî ye, ku di navbera Başûr û Bakur de de diherike. Wekî din jî navekî xweristî û folklorîk e. Av û şînahî du peyvên ku eleqetên wan zor bi jiyane re hene. Heta bîngeha jiyane ne" Em hinekî li ser rewşa nivîskariya bi kurdî peyivibûn. Gelo wê tîrî wê nivîs hebin? Em dê bikaribin kovareke bi vî rengî her ji sê mehan carekê derînin?

Helbet berdevamkirina kovare gelekî girîng bû. Diviyabû bêsekin, di dema xwe de kovar bigihîştê destê xwendanên xwe. Bi qasî tê bîra min, di wê demê de tiştê em pê mijûl dibûn ev bûn. Yanî mitala me berdevamkirina kovare bû.

Piştî bi çend rojan ez pê hesiyam ku kovar derketiye. Ez ne şaş bim, dawiya meha gulanê bû. Yanî berî niha bi du salan. Belê kovara Avaşin dikeve sê saliya xwe. Em wekî redaksiyona kovare du saliya kovare li hemû gelê xwe pîroz dikin. Dawa hevkarî û afîkariyê li xwendevan, nivîskar û hemû gelên me yê ku dixwazin ve berhema şoreşê xurtir, dewlementir û rengîntir bikin, dikin. Em jî xwendevanên xwe dixwazin ku, kovare zêdetir bixwînin û bidin xwendin. Ji zana û nivîskarên kurd jî dixwazin ku ew dest biavêjin pênûsê û bibin xebatakarê geşkirin û bihêzkirina wêje, fikir û lêkolînên cur bi curên bi zimanê kurdî.

Belê piştî bi du salan dema em li pey xwe vedigerin û pîrezeya xwe di ber çavan re derbas dikin, em dibînin ku heta niha heşt hejmarên tîrî û tije derketine. Bi dehan nivîskarên nûhatî û pênûsên stewyayî, ji hemû perçeyan û bi hemû devokan cihê xwe di nava rûpelê kovare de girtine. Dîsa bi dehan nivîskarên ku îro li zindanên dagirkeran dîl hatine girtin, gotinên xwe di nav rûpelên kovare de gotine. Kovare dengê hest û hisên wan ragihandine xwendevanan. Dîsa kovara we, hewl daye ku dengê şervanên azadiyê bigihîne hemû gelên me yê li Ewropayê. Di pêşerojê em dê li ser mijarê de bêhtir rawestin û bixwazin ku berhemên ji pênûsa wan derketine bigihînin destên xwendevanên kovare.

Wekî ku xwendevanên me jî dizanin kovara Avaşin wekî weşana Instutiya Kurdî ya li Stocholmê derdikeve. Hemû nivîsên ku xwendevan dixwazin ji me re bi rêkin. Ew dikarin li ser vî navnîşanê bişînin û wekî din jî faksa me jî ev e: Frîdhemsgatan 15,3 tr. 112 40 Stockholm-Sverige. Tel&Faks 004686523429,

Em li benda nivîsên we ne. Ji bîra nekin ku roman, çîrok, helbest û hemû berhemên din yê wêje yê tenê dikarin bi riya kovar û rojnameyên bi kurdî bi pêş bikevin. Kovara Avaşin ji bo geşkirin û xweşkirina hestên wêje yê milî heye.

Hevpeyvîn bi hunermend Baran Kendeş

Divê huner gav bi

Dengê Baran Kendeş, dengê nemaze ye di muzîka kurdî de. Dengê wî yê zelal, xwe bi lez ber dide dilê mirov û cih digire. Ew deng bi zelaliya xwe nêzîkî dengê hunermend Mezahir Xaliqî ye. Ev bû bêhtirî deh salan, ew bo çêkirina awazan û tomarkirina kasêtan dixebite. Di van demên dawiyê de kasêteke nû çêkir bi sernavê 'Şêrîn'. Baran Kendeş ji Başûrê Bîçûk, ji bajarê Kobanê ye. Niha li Helebê rûdine. Me digel wî hevpeyvînek saz kir.

Hunermend Baran Kendeş tu dikarî ji xwendevanên Azadiya Welat re li ser jînenîgeriya xwe bi axivî?

□ Erê. Navê min Feyad e. Ez kure Xênî Kendeş im. Bi navê Baran tême naskirin. Ez di sala 1969'an di li deşta Sirûcê, li bajarê Kobanê hatime dinyayê. Di sala 1981'ê de ez fêrî lédana tembûrê û gotina stranan bûm. Ji wê demê heta niha min bi sedan şahî û dawet çêkirine û bi dehan kaset tomarkirine û belav kirine. Di zarotiya xwe de min li pîrka xwe guhdarî dikir û di riya wê re min gelek stiran bihistin. Wekî Mem û Zîn, Dewrêşê Evdî, Eşya Îbê hwd. Ji bilî wê min li Mihemed Arîf Cizrawî û Baqî Xidir û Cemîl Horo guhdarî dikir.

Ta niha te çend kaset tomarkirine û hazîriya te ji tomara tu kasetan re heye?

□ Di sala 1986'an de min bi navê Baran kaset xwe ya yekem tomar û belav kir. Piştî wê kasetê min bi dehan kaset tomar kirine lê yên ku min ew bi rengêkî taybetî tomar kirine kasêtan bi navê "Mem û Zîn, Diyarbekirî û ya dawî Şêrîn" e. Di van rojên dawî de ez di hinek stranên folklorê kurdî de dixebitim û dixwazim wan vejînim. Wekî strana "Eşya Îbê", ku li ser zimanê dengbêjê mezin Mişo hatiye gotin. Ez dixwazim wê stranê bi rengêkî nûjen bibêjim.

Hunera kurdî bi gelemperî tu çawa

Hunermendê kurd berî her tiştî divê bi zimanê kurdî bistirê û xwe berde nav kaniya folklorê. Divê huner gav bi gav bi şoreşê re be. Çimkî huner jî karekî şoreşgerî ye. Ez dibînim hunermend û şoreşgerê li serî çiyar wekî hev in. Yek hunerê diparêze û yê din welêt diparêze.

dibîni?

□ Li gorî hunera cihanê hunera kurdî li paş e. Ji ber ku înstîtuyên me yên muzîkî û welatekî me yî rizgar tune ye. Ev bi xwe sedemeke bingehîn e, ku hiştiye li miletên dora me gelek awazan ji folklorê me bidizin. Di vî warî de ez dixwazim ji xwendevanên re bidim zanîn ku muzîka kurdî di bingeha xwe de gelekî xurt e. Heger hunermendên me tev bi rastî û duristî di hunera me de kar bikin, wê hunera me ne kêmtî hunera cihanê be. Lê em dinêrin gelek hunermendên me, li Ewrûpayê serfiraz û aza

ne lê ew bi qelsî di hunera me de kar dikin. Lê li welêt tevî tunebûna her tiştî kasêtan me ne kêmtî yên wan in. Hunera kurdî bi rengêkî senfonî tune ye ku em bidine hemberî muzîka cihanê. Ji bilî hinek parçe muzîkîhezan ku bi destê hunermendê mezin Dilşad hate tomar kirin.

Li gorî serpêhatiya xwe ya hunerê, tu çi alozî û keleman li pêş hunermendê kurd dibîni?

□ Alozî û kelem li pêş hunermendê kurd gelek in. Ya yekem tu saziyên ku

mafê hunermendan biparêzin tune ne. Hunermendê me her çiqas gelek berpirsên wî ji bilî hunerê hebin jî, ew ne vala ye ji hunerê re, tevî wê jî ew bi xebat û keferat karine çak û bi nîrx ji gelê xwe re pêşkêş dibe. Lê ew berhem li gorî hunera cihanê kêmtî in. Ji ber wê gelê me li hunera tirkî, erebî û ya farsî guhdarî dibe. Ji ber ku hunera wan ji ya me pêşkêştir e. Di vî warî de ez dibînim rêxistin û partiyên me li hunera me xwedî dernamekin û alikariyê bi hunermendan re nakin. Ta em welatekî aza û serfiraz ji xwe re çênekin, wê ev alozî û kelem li pêş me bin...!

Wekî ku tê zanîn folklorê kurdî zengîn e. Tu dikarî xuya bikî ku hunermend dikare çi sûdeyê jê bibîne?

□ Folklorê kurdî firehtir û mezintir e ji folklorê hemû gelên cihanê. Ji ber ku miletê kurd miletêkî kevnar e û ta niha folklorê xwe parastîye. Folklorê wekî kaniyê mezin e. Hunermend tevî jî ava wê vedixwin. Di hunera kurdî de stran hene, wekî efsaneyên mezin ku tu car kuta nabin, tîne xuyakirin. Wekî Mem û Zîn, Dewrêşê Evdî...hwd. Di sala 1991'ê de, li ser Kaniya Qestelê ku Mem û Zînê hevdî dîtine, ez seatekê stîrim û min kasetek tomar kir. Ev bes hevdîtîna wan û hîn çiroka wan dirêj e.

Lê di vî warî de ez dixwazim bêjim ku hinekan bi folklorê me listin û ta niha pê dilîzin. Carinan em stranên folklorê ji hunermendine me dibihîzin, wekî ku em stranên biyan bibihîzin. Ev folklorê divê were parastin, divê pê neyê listin. Folklorê tişteki pîroz e, divê destên bi qirêj jê bi dûr bikevin.

Huner bi rolekî mezin radibe, di riya serxwebûna gelan de. Gelê kurd ta niha bindest e. Tu dikarî pêdiviyên ku îro ji hunermendê kurd tene xwestin bidî xuyakirin?

□ Pêdiviyên ku ji hunermendê kurd tene xwestin, berî her tiştî divê ew bi zimanê kurdî bistirê û xwe berde nav



gav bi şoreşê re be



kaniya folklorê. Divê huner gav bi gav bi şoreşê re be.

Çimkî huner jî karekî şoreşgerî ye. Ez dibînim hunermend û şoreşgerê li serî çiyana wekî hev in. Yek hunerê diparêze û yê din welêt diparêze. Min bi xwe li ser şoreşgerî û şerê biratî stran gotine. Ta demê ku ez li ser evîne jî distirê, ez xwe nagirim û êş û derdên welêt bi dengê min re derdikevin. Di stranêke xwe de ez ji şoreşgeran re dibêjim:

*Şoreşgerê li ser çiyana
Natirse ji top û bimban
Ew singê xwe dide dijmin
Dil û ciger wekî hesin*

*Şefeqê kete li nav şevres
Gava ku bi rê ket şoreş
Bibihîsin gelên cihan
Bi xwinê me çêkir jiyana*

Gotinên stranên te, tu bi xwe dinivî-

sîni an tu ji helbestvanan distîni?

□ Carinan ez bi xwe datînim, lê pir caran ez ji helbestvanan distînim. Min ji helbestên Cigerxwîn, Bêbihar, Jan Dost, Bêzar Kobanî, Bargiran, Xemgîn Remo... û hineke dîtir stran çêkirine.

Tu mûzîka kurdî ya li bakûrê Kurdistanê çawa dibîni?

□ Gelek dengbêjên xurt li bakûrê Kurdistanê hene. Lê ez dibînim ku dengbêjekî kurd li derveyî welatê çî distirê, ew jî wekî wî distirê. Divê ew bi rengêkî taybetî bistrên. Kesayetiyekê jî stranên xwe re çêkin. Muzîk û dengê wan xurt e û tomarkirina wan baş e lê stranên wan ên nû tune ne.

BÊZAR KOBANÎ

Ez dixwazim bidim zanîn ku muzîka kurdî di bingeha xwe de gelekî xurt e. Heger hunermendên me tev bi rasfî û durisfî di hunera me de kar bikin, wê hunera me ne kêmi hunera cihanê be. Lê em dinêrin gelek hunermendên me, li Ewrûpayê serfiraz û aza ne lê ew bi çelsî di hunera me de kar dikin.

*Taca Serê min Heso
Tirajîka birê ye
Heso ji wê da tê ye
Heta Eyşoyê sax e
Zeko li Heso yasax e*

*Taca serê min Heso
Roniya çavê min Heso*

*Mal û milkê
min Heso
Roniya çavê
min Heso*

*Elîşar e bi tar
e
Dara girtî
hinar e
Heso ji dor te
hatî
Yara Heso
ne li Mal e*

*Taca serê
min Heso
Mal û
milkê min
Heso*

*Mal û
milkê min
Heso*

Heso Heso Heso

*Kobanê li ber xetê ye
Heso bi trêne tê ye
Yara Heso li bendê ye
Eyşo qet rê nadêye*

*Taca serê min Heso
Mal û milkê min Heso*

*Berxa Mala Min
Ay ay ay ay ay*

*Gula mala min tu yî
Berxa mala min tu yî
Jiyana min tu yî
Bermala min tu yî*

*Heyla canê canê
Gula mala min canê*

*Ay ay ay ay ay
Ji bo min tu can î*

*Her kes
dora min
anî
Stêra
şevanî,
strana
Baranî*

*Heyla canê
canê
Berxa
mala'm
canê*

*Ay aya ay ay
ay
Çavani
digerînim
îro te nabînim
Ji dilka birînim
Tu derman î
canê*

*Canê canê canê
Nêrgiza mala'm canê*

*Ay ay ay ay ay
Heyda heyda tu yî
Gula mala'm tu yî
Gula jiyana'm tu yî*

*Heyla canê canê
Gula mala'm canê*



Mirî ranazîn lê em?

Belê rast e ku em xwedî çand û hunereke dewlemend in. Lê em tenê bi guhdarkirina çîrok û pêkenokekê bipêş nakevin û parastin û xwedî derketina li van tiştan jî wiha bi erzanî nabe. Bi vê helwest û mebestê tu car mafê me nîn e ku em bi huner û ronesansa kurd qure bibin. Berî hêemû tiştî divê em wek pêwistiyeke welatparêziyê û gelperweriyê, ji bo geşkirin û bilindkirina van nirxên xwe yê nirxên xwe yê neteweyî xwe deyndar û berpirsiyar bihesibînin.

Di serê meha avrêlê de, li bajarên Edene û Mêrsînê, Teatra Jiyana Nû bi listika xwe ya bi navê "Komara Dînan-ŞERMOLA" derket ser dikê. Ev listik ji çîrokeke Helîm Yûsiv hatiye wergirtin ku ev çîrok jî di pirtûka nivîskar a bi navê "Mirî Ranazîn" de cih digire. Girê Şermola li bajarê Amûdê navê goristanekê ye. Kesên ku li vê goristanê radizên, bi piranî sedema mirina wan, jî bêkesî û jî bêpiştîyê ye Nezanî, bewarî û pîrsgirêkên civakî û neteweyî ew zû dîn kirine û pîrên wan bêwext mirine û bûne mêvanên Şermolayê. Lê piştî mirina wan kesan jî dawî li dînbûna wan nayê û pîrsgirêkên wan her dom dikin. Ji ber ku goristana ku ew lê radizên parçeyek ji axa Kurdistanê ye û hê jî ne azad e û hê jî rojê kesekî/e bêwar, bêpiştî û bindest di nav axa xwe ya bi jan de dihêwîne. Ev jî dibe sedema xwebirêxistîna miriyên dîn û xwenaskirina wan. Lewre jî li gorî wan di nav alozî û bagera vê jîyanê de kesê ku dîn nebe bi rastî ew kêmhîş e û tîrsonek e û dînbûn xwenaskirin û vejîn e. Ji ber vê yekê jî ew dînbûna xwe wekî "Pewistiyeke xwedayî" dibînin. Ji bo jîyanekê birûmet û serbixwe divê her kes dîn bibê û divê tu miriyekî/e Şermola ne wek miriyekî/e jî rêzê be û tiral û bêdeng nebe. Divê tiştêkî wîsa bikin ku nekarîne di jiyana xwe de bikin. Her wiha ji miriyên Şermola "Komara Dînan" "bi vê mebest û armancê ava dikin.

Şermola li Edeneyê du car (seans), li Mêrsînê jî sê caran hat listin. Tevî ku cejna qurbanê bû jî, gelek kes ne li ser karên xwe bûn û firsenda wan a çûna şanoyê hebû, dîsa jî li her du bajarên bi tevahî derdora hezar kesî li listikê temaşe kir. Ez dixwazim bibêjim ku pîrsgirêk ne hejmara kesan e û

ne jî têngihiştina gelê me ya bi girîngî û pêwistiya şanoyê ye. Pîrsgirêk ev e ku gelê me li ser zimanê xwe ne zal e (hakîm), ev jî dibe asteng, li ber têngihiştina mesaj û naveroka berhemên çandî û hunerî.

Min jî wekî temaşevanekî û hem jî ji bo çavdêriyê li ser eleqeya gel li listikê temaş kir. Lê ez dîsa bûm şahidê tiştêkî ku her dem min

Îro ji hêrêmeke wekî Çukurovayê hêviyeke mêzin tê kirin, ji ber ku bi hezaran kurd lê dijîn û ev der bûye qada têkoşînê ya gelê kurd. Lê li hemberî vê yekê ev bê eleqeyî û ev rewşa xerab bi rastî jî mirov xemgîn dike û mirov kûr difikirine.

Ez di tiştêkî din jî gihîştme ku gelê me (bi parandî rewşenbîr û xwendevan) hînbûna zimanê kurdî ne bi hesteke nete-

ye. Ez şaş dimînim jî van kesan re, tevî ku her roj "Mafê Perwerdehiya bi zimanê zikmakî" dixwazin û bi xwe jî di nav nakokiyê qirase de ne û xemsar û sersar dijîn.

Di gav û pêvajoyên netewebûnê de çand, huner û bi giranî jî ziman rolêke girîng dilîzin. Ev rastiyeke li ber çavan e û em bandora van tiştan a erênî di jiyana xwe ya îroyîn de, bi hebûna saziyên xwe dibînin. Em her

roj bi şanazî behsa ronesans û mîlada kurd dikin. Em bi wêje, mûzîk û zargotina kurd a dewlemend, nûkirin û pêşxistina çand, huner û ziman em xwe çiqas binbar û berpirsiyar dibînin?

Belê rast e ku em xwedî çand û hunereke dewlemend in. Lê em tenê bi guhdarkirina çîrok û pêkenokekê bipêş nakevin û parastin û xwedî derketina li van tiştan jî wiha bi erzanî nabe. Bi vê helwest û mebestê tu car mafê me nîn e ku em bi huner û ronesansa kurd qure bibin. Berî hemû tiştî divê em wek pêwistiyeke welatparêziyê û gelperweriyê, ji bo geşkirin û bilindkirina van nirxên xwe yê nirxên xwe yê neteweyî

xwe deyndar û berpirsiyar bihesibînin. Ku hebûn û dewlemendiya nirxên me, me nekişîne nava çalakiyekê û di jiyana me de guherînekê peyda neke, em bi çî rengî dikarin bibin mîratxurên vê dîrok û çanda dewlemend û bi çî maffî em dikarin pê qure bibin.

Belê me di pêvajokeke dîrokî re derbas dibin. Mirovahî jî bi jîyanekê birûmet tédikoşe. Em nikarin jî vê têkoşîn û lebatê bi şûn de bimînin. Ji her kesî bêhtir em hewcedarî pêşveçûn û zanîstiyê ne. Sedsala bîstan vîya jî her kesî bêhtir dispêre me kurdan. Vayê miriyên me yê di goran de jî bi vê ya gihîştine û bangê li me jî dikin. Ma em ê kengê hewl bidin xwe û lebatê bikin?

RIFAT DUMAN



Dimenek ji şanoya "Komara Dînan (Şermola)"

diêşîne û min bêhêvî dike. Ji destpêka listikê û hetanî dawiyê pirî temaşevanên di guhên hev de dikirin kurepîst û ji hevdu ev pîrs dikirin 'çî got?'. Piştî perdeya yekemîn ku em ji şalonê derketin derve, di wê navberê de me ji hinek temaşevanên di derbarê mesaja listikê de şîrove xwest lê hejmara kesên ku di mesaj û naveroka listikê gihîştibûn zaf kêmbûn. Gelekên ji wan digot: "Ji ber ku ez ziman baş nizamim, min ji listikê tiştêkî fêm nekîr. Temaşevanekî ji ku ez nas dikim (hevalê min e) ji min ev pîrs kir: "Ma ev dîn çî dibêjin?", ez jî hinek bi vê pîrsa wî êşiyam û min wiha bersiv da: "Dibêjin ku wa ye em ji bo we komarekê ava dikin û hûn jî ji kerema xwe re êdî zimanê xwe hîn bibin."

weyî û welatparêzî, lê wekî fantaziyeke dibînin. Ez bawer nakim ku tu rewşenbîr û xwendevanekî/e kurd hebe ku bi girîngiya zimanê zikmakî nizanibe. Ku li ser vê mijarê tu wan bidî axaftin, di tûrê wan de çiqas gotin hebin wê li ber te vala bikin, lê ji bo pêkanîne tu hewl nadin xwe. Ku tu li rojnameyên destên wan, kovarên li ser maseyên wan û li nav pirtûkên ku di dolabên xwe de rêz dikin dinihêrî ji bo Xwedê tu rojnameyêke bi kurdî an jî kovar û pirtûkeke bi kurdî nabîni.

Dema ku bi zimanê "dijminê xwe" diaxivin, mirov ji gotin û mijûliyên wan têr nabe. Lê bi zimanê xwe yê zikmakî jî dizanin, bibêjin "rojbaş" "êvarbaş" û "spas dikim". Hînbûna van çend peyvên jî ji bela fantaziye

NÇM-Stenbol

● 30 gulan 1998 şemf:

Panel: "Ji HEP'ê heta HADEP'ê kesên ku ev pêvajoyê jiyane."

Beşdar: Ji DEHAP'ê Ayhan Demir (Sekreterê Giştî yê DEHAP'ê)


Ji HADEP'ê Mahmut Şakar (Serokê Giştî yê HADEP'ê), saet:14:30

Konser: Yelda Saet:18:00

31 gulan 1998 yekşem:

Konsera Hozan Hogir, saet:14:30

CALAKIYÊN HEFTEYÎ



NÇM-Sînema Film: "Bavê min li gera kar e"

Derhêner: Emir Kustarica Saet:18:00

Li NÇM'yê Îzmîrê

● 30 gulan 1998 şemf:

"Roja xwarinên kurdî yên gelêrî ya 22'yan"

31 gulan 1998 yekşem:

Konser: "Garan" Agirê Zerdeşt, saet:18:00

Bo piştgiriya Dayikên Şemiyê û Mayo-De Plaza çalakiyek:

'Yên ku winda dikin dê têk biçin'



Komîsyona Jinan ya HADEP'a Îzmîrê roja 23 ê gulanê li NÇM'ê, ji bo salvegera sêyemîn a berxwedana Dayikên Şemiyê yê Stenbol û Edeneyê çalakiyêke piştgiriya li dar xist. Çalakiya ku bêhtirî 200 dayik beşdar bûn, bi rawestîna rêzgirtinê ya ji bo giyana şehîdên şoreşê dest pê kir.

Piştî rêzgirtinê ji rêveberiya HADEP'a Îzmîrê Reyhan Çomak ji bo ku axaftina vekirinê bike, hate vexwendin. Çomakê wisa dest bi axaftina xwe kir: "Îşkenceyên hov, qul û qewarên tarî de didomin, avêtina ser malan, tecawîz, qetlîam, windakirinên di odayên bi xaz de, sûtikastên fail-i meçûl, çekên kîmyewî ku dibin sedema mirina bi hezaran kes û windahiyan ku cendekên wan jî nayên dîtin..."

Rêvebera HADEP ê axaftina xwe wiha domand: "Pirsgirêka windahiyan ne bi tenê pirs-girêka 2-3 welatan e, lewre ev pirsgirêk biyê pirsgirêkeke navneteweyî. Heta îro li Arjantîn, Şîlî, Sîrî-Lanka, Somalî, Afganîstan, Iraq, Fas, Guatemala û Tirkîyeyê bi sed hezaran bûyerên windahiyan pêk hatine û hê jî pêk tên. Bêguman karker, kedkar, rêxistinên şoreşger û dayik bêdeng neman û nehatine bêdengkirin. Ew bûn qêrîna bi sedhezaran. Ev 21 sal in ku her roja pêncşemiyê Dayikên Mayo De-Plaza li Arjantînê qir dikin û qirîna wan heta

îro pêl da û sinor şikandin. Li Tirkîyeyê Dayikên Şemiyê deng dan û pêvajoya tekoşîna winidahiyan gaveke din avêt. Ji roja 27 ê gulanê 1995'an û vir de dayikên şemiyê tevî rewşenbîr û hunermendan, bi beşdariya karker, kedkar, karmend û xwendekaran her ku diçe bi girseyî dibe. Di bin çav de windabûn, bi taybetî piştî 12'ê rezberê bû parçeyek ji jiyana rojane. Ev yek bi şerê qirêj re girêdahiye. Bi salan e ku em pest û kotekiyên ku li ser kurdan tê meşandin, dizanin" Her wiha Reyhan Çomakê bal kişand ser Konsept 93'yan û peywendiyên di navbera M. Açar û T. Çillerê û got ku, divê roj bi roj jin xwe bi rêxistin bikin, da ku karibin bigihînin asta Zîlanê. Wê axaftina xwe wiha qedand: "Dayikên Şemiyê rûmeta me ne, kesên ku winda dikin dê têk biçin."


Piştî Seroka Komîsyona Jinan HADEP'ê Asiye Tokay di axaftina xwe ya bi kurdî de, girîngiya yekîtiya jinên a rêxistinî anî zimên.

Dûvre jî bi slaytê dimenên Dayikên Şemiyê hate pêşkêşkirin. Ji NÇM'ê Koma Zarokan "Koma Dengê Bahoz" çalakiyê geş kir. Hozan Xanemîr jî bi stranên xwe rengêkî taybet da çalakiyê.

A. WELAT/İZMİR

TÎŞK

Hêza pêkenîne



OSMAN ÖZÇELİK

Ji hemû fabrîqeyan dengê xebatê tê/ Lê belê, tu kes naxebite. Tu kes naxebite/ Lê belê, her kes meaş dîstine. Her kes meaş dîstine/ Lê belê, tu kes nikare tu tiştî bikire. Tu kes nikare tu tiştî bikire/ Lê belê, her tiştê her kesî heye. Her tiştê her kesî heye/ Lê bele, tu kes ji halê xwe ne xweş e. Tu kes ji halê xwe ne xweş e/ Lê belê her kes sîstemê diparêze.

Li Rûsyaya kevn, bi navê "nakokiyên sosyalîzmê" ev gotinên jorê, dev bi dev belav dibûn. Gelê ûrîs û gelên din yê "Sovyetîstanê" bi nexweşiya sîstemê hesiyabûn. Naskirina nexweşiyê girîng e. Ku nexweşî hat naskirin, riya saxkirinê eşkere dibe.

Carinan, hêza bîr û aqilê gel a tevahî, dikare nakokiyên civakî bi çend rêzikan bîne zimên, ku mirov nikare bi cildên kîtêban îfade bike. Di rêzikên jor de; tiralî, neheqî, tunebûn, sûka reş, dizî û tirs bi zimanekî nerm, belê bi tundî tê rexnekirin. Ev tehrek edebî ye. Pêkanîna Reş (Houmeur) di edebiyata nûjen de cihêkî girîng digire.

Li Sovyetîstanê tu kes ji sîstemê ne razî bû. Lê rexneyên eşkereyî ne karê kurê her bavî bû. Mirov bi carekê bêhna xwe li Sibiryayê vedikir. Rexne bi dizî û bi devkî dihatin kirin. Her kes ji hev ditirsiya. Yê ku biryara cezakarîna muxalîfan didan, ew bi xwe jî muxalîfên sîstemê bûn. Piştî hilweşîna sîstemê parêzgerên sîstemê yê herî hişk, li xwe mikur hatin ku wan jî dîzanî ev sîstem, sîstemêke hovane ye. Sîstemê, zordarî, bêbawerî, dizî û durûtî hildiberand.

Nivîskarê mezin ê edebiyata pêkenîne, Azîz Nesin, di sohbeke me ya li ser huner û hêza hunera pêkenîne de wiha digot: "Di rojên zor û zordestiyê de, ku gel bêhêz, bêrêxistin û bêhêvî dimînin, bi refleksa xweparastinê, meselokên pêkenîne diafirînin û qerfê xwe bi rayedaran dikin. Nakokiyên civakê bi bîrbirineke tûj û bi zimanekî sade tînin ber çavan. Pêkenîni, bi pistepîst di nav gel de belav dibin û hêdî hêdî sîstemê dirîzin. Mîna koka dara ku kurm û kêzik ketibê. Û rojekê dara ku qerase dixuye, bi gurmîn hildiweşe."

Mirov bi hêsanî dikare bibêje, sîstema Sovyetîstanê, sîstema "Dîktatoriya Proleteriyayê" bi hêza meselokên pêkenîne hilweşiya. Di rojên beriya hilweşîna sîstema sosyalîst de, bi sed hezaran pêkenînen li dijî sîstemê di nav gel de belav bûbûn. Min ev yek ji nêz ve bi çavên serê xwe dît. Li ber deriyê metroya Moskoyayê bi sedan kîtêbên pêkenîne dihatin firotin. Ji wan pêkenînan yek wiha bû.

Li Sibiryayê, li kampa xebatê, du girtî sohbetê dikin.

-Rêheval, te çend sal xwarine?

-Panzdeh sal.. Lê çend sal dane te?

-Yê min jî panzdeh sal.

-Sûcê te çi bû?

-Hîç!

-Na, îlem te tiştêkî neqenc kiriye.

-Tu ji ku dizanî?

-Ji ber ku ez dizanim ceza "hîç" ê deh sal e. Lê yê mayî?

Tu sîstem tune ku bikaribe li dijî rexneyên wisa li ser piyan bimîne.

Li dijî sîstema Tirkîyeyê ya îroyîn, kurdan bi her awayî serî hildaye. Ji destê me çî tê, em dikin. Lê 'kardêş' ên me? Qet. Lê 'Yoldaş' ên me? Çêtir e ku ew tu tiştî nakin.

Emê birîna xwe bi destê xwe bixurînin...

Kela Xan



Diçin bi gel re xeber didin, zêran belav dikin, gel li dora kelehê dicivînin. Newalên kûr, çiyayên bilind, daristanên gur, dibin para seriya xwezayî. Gel, kelehê û dora kelehê bi firêqetî wekî qada rizgarbûnê, dibîne. Li wir dest bi jiyaneke nû dîke. Ew der, dibe qada evîn û serpêhatiyên nû. Gel, di vê demê de Xanê Lepzêrîn, di nava dilê gelê kurdên wê herêmê de cihêkî bêhempa girtiye. Li pey hevdu mirov tene dora kelehê bi cih dibin. Di vê demê de nav û dengê Xanê Lepzêrîn li dinyayê belav dibe. Pêdiviyên gel yê heft salan dihatin peydekirin.

Xan, li ser van amadehiyan, dest bi şerê rizgariyê kir. Li hemberî şahê Îranê şerekî cindî de. Şer, bi salan berdewam kir. Bi serkeftina hêzên Xan dimeşiya. Ku şer gihîste sêsalîya xwe, negihîştibû encamekî xurt, lê hema bibê li hemû Kurdistanê belav bûbû, gur dibû. Di vê demê de xayintiya Mehmûdkê Lêtanî li ser zimanan bû. Mehmûdkê Lêtanî, ku ji pêşî da bi Xan re bû, bi dozê re xayintî dîke û xwe dispêre şah. Dide pêşiya leşkerên şah û digirin ser hêzên Xan. Demeke dirêj ev rewş berdewam dîke. Gelek kesên ku bi Mehmûdkê Lêtanî dixapin, şehîd dikevin. Dewlet hemû giraniya xwe dide ser, lê nikare pêk bîne. Her ku bi ser kelehê de diçe, têk diçe.

Di kelehê de, tevî Xan û şervanan gelek zarok jî hene. Xan bêhtir pêşeroja zarok û pîrêkan difikire. Ev mesele wî pir xemgîn dîke.

Mehmûdê Lêtanî ku sirên vê kelehê ku dizane, ji serbaz û wezîrên şah dibêje: "Ez sirên vê kelehê dizanim. Bêyî van siran hûn nikarin kelehê bi dest bixin." û xwe vedişêre: "Bi qasî hezar mîtroyî dûrî kelehê, kaniyek ava kelehê heye. Ava kelehê ji wir diherike".

Diçin wê kaniyê dixitimînin. Heriyê dikutinê û xwîna sewala pê de berdidin. Hin bi hin ziwa dibe. Rojek- du roj şûn de, ji selebê ew zip û ziwa dibe.

Keleh bêav dimîne. Di vê rewşê de ji hêzên şah êrîşî ser kelehê dikin lê Xan tevî hêzên xwe yekser li wan vedigerîne. Piştî çil rojan Xan ji bo ku ji der ve alîkariyê ji dostên xwe bixwaze, bi dizî qasidekî dişine bal hêzên rom û tirkmenan. Ew jî dostaniya xwe nişan didin û dibêjin: "Li ber xwe bide, hetanî hefteyekê em li wê derê ne."

Qasid vedigere û berê xwe dide Îranê. Di çol û çiyayên bi der rojê ve dimeşe û digihê gundê Qamê. Hingî betiliye, name di ber papaxê wî de, li ser kaniyê xwar dibe, avê vedixwe û li kelêka kaniyê kincên xwe sist dîke û radi-zê.

Rêwiyek ku di wê re derbas dibe, qasid bala wî dikîşîne. Ku hinek nêzî wî dibe li dinihêre kaxizek di ber serê wî de ye. Radihêje kaxizê dixwîne. Ew jî kaxizekî din diniwîsîne, ku: "Hetanî heft sala şer bike, li ber xwe bide, emê bigihîjin hawara te." û dîsa dixwe ber papaxê wî û kaxiza din jî diavêje.

Qasidê ku haya wî ji tiştêkî tune ye, radibe dimeşe û xwe digihîne kelehê. Xan bi kêfxweşî nameyê jê distîne. Lê belê piştî xwendinê mada wî tîrş dibe û vedigere ser qasid:

- Di çil rojê bêavmayîne de ne, min tu şand, di vê zelûliyê de ev bû pênçî roj ku, em li ber xwe didin. Me ji bo alîkariyê, berê soz dabû hev du. Niha jî dibêjin: "Heft sal şûn da, em ê werin hawara te." Xan, ji bêgaviyê û ji ber rewşa jin û zarokan a xirab, nikare li berxwe bide û teslîmî hêzên şah dibe.

Berxwedaneke hêzdar a din jî ku pir hatibû nêzî serkeftinê, binerdi dîroka Kurdistanê bû. Li cihê wî bû Geliyê Xan, Xanê Lepzêrîn. Her sibe, pêşî ji pişt wan geliyan de beyan zelal dibe. Ji rojê dibe qada jînbarîne. Li wir seran ser sorgul raxistin jê qut nebûn, ji bo tohildana dîrokî.

Qediya.

MEM BOTANÎ

Gotinên pêşiyar

- ✓ Dît xwedî me, nedît rêwî me.
- ✓ Dît ez im, nedît diz im.
- ✓ Axa bi xulam, xulam bi olam, olam bi jî bi tentene ye.
- ✓ Dê bibîne, dotê werîne.
- ✓ Dê ber bi weleda, weled ber bi Çiyayê Qaf.
- ✓ Du serî di beroşekê de nakelin.
- ✓ Ez geriyam li Şamê dinê, ez nefilîtim ji ber mirinê.
- ✓ Ê bike zehmet, wê bixwe rahmet.
- ✓ Genim bû firîk, mele bû şîrîk.
- ✓ Goştê ga li ser postê ga tê hûrkin.
- ✓ Girarî qebûl e, xwedî qebûl e.
- ✓ Girara rijî ji kêm qewetiyê ye (feqîrî).
- ✓ Hekê bi mila, bi ap û xalî.
- ✓ Huksuf (sikût) şifa bedenê ye.

- ✓ Hûrik hûrik, tife tûrik.
- ✓ Ji maliya xeydane, ji mêvana dilgiran e.
- ✓ Mêro bi sedî sedo ne biyekî
- ✓ Ji teştê xwe têr nan be, ji mêrê xwe têr gan be.
- ✓ Mirin, paqijîya dîne Mihemed e.
- ✓ Kor naht in (nerihet), keçel bahs in.
- ✓ Jin çûn hawaran, mêr ketin kewara
- ✓ Tiştî bi nêvî, jê neke hêvî
- ✓ Yê ku ji hindikî ne şêkirîne, ji pîrî re naşêkirîne
- ✓ Golikê malê, ji gayê malê natirse.

nepirse.

- ✓ Mal têr e, kevanî jîr e.
- ✓ Rev nêvî mêraniyê ye.
- ✓ Kalê zemanan, dipirse ji xortê geriyayî.
- ✓ Bûk li hespê ye, kes nizane risqê kê ye.
- ✓ Bira bira ye, hesap li derê ha ye.
- ✓ Her kes xwe li agirê xwêş digire.

Berhevkar:
MEHMETŞAH XWENAS - ÇIYA MAZ

Jiyana Rewşen li ber pêvajoyeke nû ye

Ziman wekî gihê, wekî rehê, wekî darê ji ber xwe çênabin û hêşin nayên. Zimanin bêtaqet, lawaz û kulek didominên, zimanin jî zindî, têkûz û tixis in; bi qasî ku barê hemû tégihan bikaribin hilbigirin, hêzdar in. ... Tim ziman ji heman çavkanî û binyatan diherikin tên. Lewre gava ku mirov hin zimanan bipesînin, hin zimanên din biçûk bibîne, rexne lê bigire, ev yek çewt e. Ziman ji hêza mirov a hêmayî (îmgesel) dizên.

Ev gotin ji pişt berga pêşin a hejmara dawîn (hejmara 19'an) Jiyana Rewşen hatin wergirtin. Ev gotinên ku serpêhatiya zimanî kurdî jî baş berbiçav dikin, ji pirtûka nivîskarê frensî Joachim du Bellay a bi navê "Parastina Zimanê Frensî" hatine wergirtin. Pirtûka navborî di sala 1549'an de hatiye nivîsandin.

Di pêşeka vê hejmarê de bi şeweyekî helbestî çêlî êrişên dawîn yê li ser NÇM, HADEP û IHD'ê de tê kirin û li ser lêqewmînen van êrişan wisa hatiye ev gotin: "...Yanî ev xweşmêr û xweşkeçên ku pûşiya şevê li rûyê xwe digerin, berê xwe didin roya çav jê dixemirin û carekê jî li paş xwe nanihêrin. Ew dibin ku-

Her wiha berpirsyarên kovarê radigihînin ku, ew dê pêvajoyeke nû bidin destpêkirin û giraniyê bidin ser nivîsên têrnaverok û şarezane. Lewre ew ji xwendevanan daxwaza nivîs, gotar, lêkolîn, kurteçîrok û helbestên bi vî rengî dikin.

lîlk, dema ku ji lînûska jiyane tê birin. Lê hukmê xwe didomînin ji kûrahiya axa welêt heya guliyên daran. Di her çilkekê baranê de datên."

Her wiha berpirsyarên kovarê radigihînin ku, ew dê pêvajoyeke nû bidin destpêkirin û giraniyê bidin ser nivîsên têrnaverok û şarezane. Lewre ew ji xwendevanan daxwaza nivîs, gotar, lêkolîn, kurteçîrok û helbestên bi vî rengî dikin.

Di vê hejmara Jiyana Rewşenê de giraniya helbest û kurteçîrokan berbiçav e. Helbestên Miraz Pîranî, A. Rahman Çelik, Kawa Nemir, Arşevê Oskan, Cegerxwîn, Bêwar Îbrahîm, Şêxmûs Sefer, Hasan Harran, Cemil Denli, Ciwanê Abdal, Adar Jiyân û Dost Çiyayî di vê hejmarê de hatine weşandin.

Her wiha kurteçîrokên Pîr Rustem, Nezîr Melenewaf, Nezîr û Gafûr Doğan di nav rûpelên kovarê de ji xwe re cih dîtine.


Nivîsên dimilkî û soranî jî balê di vê hejmara kovarê de diksînin ser xwe. Siraç Bilgin bi navê "Ajî Dahaka û Kawa" nivîsek darêjiyê. Dîsa Sirwan Rehîm bi navê Metel li ser metelokên soranî nivîsek amade kiriye.

Wekî pexşan jî nivîsa Nuray Şen a bi navê "Riha" û ya H. Kovvan Baqî ku bi navê "Potreyeka Nivco Ji Hêstîrên Helbestê ye" hatine weşandin.

Li layê din Feqî Huseyn Sağniç der barê jînenîgarî û helbestvaniya Mewlana Xalid de, Konê Reş jî li ser serpêhatiya jina Qadi Muhammed Mîna Xanim û jina Celadet Bedirxan Rewşen Bedirxan de nivîsek aniyê pê.

Her wiha Gabar Çiyân bi piştgiriya straneke stranbêjê navdar yê suryanî Gabriel Esad bi navê Dilên Şewitî-Agir Pêketî Werdê û Gewriye kurtserpêhatyek nivîsandiye. Çîrokên berhevkerî jî di kovarê cih digirin.

SERWISA ÇANDÊ



Nivîskarî û çîlekêşî

MEDENÎ FERHO



Berê me ketiye Meletowê!.. Nivîskarên kurd ku zimanê tirkî ji xwe re kirine bingeh, mikewna xwe ya çeleng û zîrek di zimanê tirkî de nîşan didin. Gelo çima?

Çima tovê waweylê direşînin? Kê ew maf dâye wan?

Ew çawa wî mafî di xwe de dibînin?

Bersiva pirsan hinekî giran e. Lê belê, mirovê ku şûjina di çavên xwe de nebîne, nikare derziya di çavên kesan de bibîne. Nivîskarên kurd ku bi zimanê tirkî dinivîsin, di nava wêjeya tirkî de nikarin (nikariybûn) xwe bidine qebûl kirin. Nû û kevin!.. tev li derveyî civaka wêjevanên tirkî diman. Dema civaka wêjevanê kurd derkete holê, xwe lê girtin.

Kê rahişte pênûsê û çend xêzik rêz kirin, qîr dan, bangewazî serê çiyân kir, tewirand pirtûkek weşand. Û bi tirkî!..

Rast e coxrafiya wêjeya kurdî beyar e.

Cihê lîstik û tevgerê pir e, lê ne bi awayê zimanê tirkî ku rê li ber berhemên kurdî girtine. Ne bi awayê ku riya danasîn û nixandinan li ber berhemên kurdî girtine. Ne bi awayê ku riya danasîn û nixandinan û afirandina berhemên karekî bi nix, pîroz û rûmetî ye. Gelo ev nix, ev pîrozî û rûmetî çima ne ji bo zimanê kurdî be?

Erdê beyar ku ji bo nivîskarên çeleng û zîrek li bendeyî xilmet kirinê ye zimanê kurdî ye. Wêjeya kurdî ye. Bi rastî her roja ku derbas dibe hejmara nivîskarên kurd zêde dibe, Xwedê, ango Yezdan wan hê zêdetir bike. Her diçe çirîskek ronî dide. Her diçe çirîskek ji bo paşeroja wêjeya kurdî dibe gind û çira.

Be daxewe ku hin gav henê me dilsotî dikin. Yek; payendeka Özgür Politika ku hinek rûpelên xwe ji kurdî re veqetandine. Çend rojên pêşî Bavê Nazê bi kurdiya xwe ya delal dinivîsî. Pişt re nav zêde bûn. Ku nav zêde bûn (be daxewe, mixabin) sifrê waweylê jî zêde bûn. Mînak: Hejmara 25'ê gulanê, nivîsa Zeynel Abidin ku li ser navika xwe dibirê.... Tovê waweylê bû. Mê û nêr li hevûdin siwar kirine. Kijan gotin Elî ye

kijan gotin Gulê ye!.. Di zimanê kurdî de gotinên Elî û Gulê, ango nêrûmek nîn in, yan nêr in, yan jî mê ne. Di 20 hevokên destpêkê de 19 şaşî... Aya ev çawa nivîskarî ye?

Wilo redaksiyon nabe. Gelo nivîsa Huseyin Kartal û nivîsa Hekîm Sefkan, çima wiha ne? Tewanbar redaksiyon e, yan nivîskar e?

Eger mirôvên me ku li ser navika xwe dibirin ku dibêjin ez û ne tu kesî din, wiha berdewam bikin, diwaroja wêjeya kurdî wêranî ye.

Rast e, eger wiha berdewam bike, di rûpelên rojnameyên kurdan de pirtûk û nixê tirkan bêne nixandîn û bêne nasandin, pirtûk û nixên kurdan li devê dergehê heywana jêr bimînin, berê me li meletowê, li riya çûn û nehatinê bû. Di qonaxa îro de cihan biçûk bûye, êdî ne Sêrtê, ne Bêrtê û ne meletowê...

Lê belê, pêşiyên gotiye, kesê neke zehmet, nabîne rehmet. Çîlekêşiya karê nivîsandinê bêhtirî her karî ye. Hêvî heye... Cihê hêvî lê hebe serkeftin jî heye.

Divê neyê jibîrkin ku serkeftin bêyî çîlekêşiyê çênabe.

Zema şertê îslamê

Pîreka Fenek

Gundiyeke rojekê bang li du-sê hevalên xwe dike û dibêje wan:

- Werin em herin gundê cîran. Em derheqê dîne îslamê de ji xwe re bipeyivin, tiştinan hîn bibin û dîne xwe baş bielim, nas bikin.

Hevalên wî jî wê yekê dipejirînin. Radibin ereba xwe ya hespan girêdînin û didin ser rîya gund. Têne nêzîkî gund, bala xwe didîne ku şivanê gund li ser rîya wan e. Gundî dibêjin:

- Hela kanî em ê sewalekê duduyan ji şivanê wan bikin. Hela ka ewê der heqê dîn de çi bersivê didê me.

Dibêjine şivan:
- Tu dizanî şertên misilmantiyê çend in?

Şivan dibêje:
- Belê
Gundî dibêjin:
- Çend in?

- Welleh hetanî duh êvarê jî pênc bûn. Heger ku îşev zem-memê lê ne-xistibe, pênc in. Lê ku zemê lê xistibe an heşt in an jî neh in.

Gundî lê vedigerînin:
- Çima ne şeş û ne heft in, çima



heşt û neh in?

Şivan dibêje:

- Zû de zem nehatiye ser. Ji wê

yekê heger bê, wê pir be. Ji ber wê yekê an heşt in an jî neh in.

MEHDÎ BAXÇA

Pîrekeke bi mêr, bi zilamekî din re dostiyê dike. Rojekê ew û dostikê wê li hundirê malê ne, di wê navberê de mêrê wê tê malê. Jinik zûzûka dostikê xwe vedîşere. Lê belê mêrê wê dostikê wê dibîne, lê qet dengê xwe nake. Li ser wê yekê jinik dikeve şîkê û di ber xwe de dibêje: "Gelo mêrê min, dostikê min dît na?" Di pey re bang li mêrê xwe dike û dibêje:

- Delika me li axur teliqiye. Were em navan li cewrikên wê bikin.

Mêrik daxwaza wê dipejirîne. Gava diçin hinda cewrikan, jinik bi stûyê cewrekekî digire û dibêje:

- Em ê navê wî bikin "Nizanim dît an nedît!..."

Îcar mêrik bi stûyê, cewrikekî digire û dibêje:

- Em ê navê wê cewrikê bikin "Dît û deng nekir!..." Piştê jinik bi stûyê cewrikekî din digire û li mêrik vedigerîne:

- Tobe û sed car to be!..." Li ser wê yekê, îcar mêrik bi stûyê cewrikekî din digire û dibêje:

- Em ê navê wê cewrikê xwe bikin 'Kurmê şîrî, heta pîrî'.

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (122)

XAÇEPIRSA

B	T	H	K	B
S	R	M	N	E
L	E	M	T	E
H	A	J	A	R
L	A	S	I	N
A	V	A	R	E
Ü	Ş	T	K	O
E	R	Ê	Z	I
A	N	S	O	R
A	L	Î	T	Ü

PEYVA VEŞARÎ → KENAN MAK

Bersiva Xaçepirsa 119'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 122'yan pirtûka Sadrettin Aydınlik "Özgürlüğe Yürüyüş 2'ye"


Jêrenot:
Ji bo ku bersiva wê bê nirxandin, divê hûn "Peyva-veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsa de binivîsîn û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên xelata hejmarê 120' pirtûka Müslüm Yücel 'Tekzip' qezenc kirine: Mustafa Fırat/Êlih, Hüseyin Tilki/Dîlûk, Saide İnanç/Mêrsîn, Cüneyt Botan/Wan, M.Arif Öncü/Mêrdîn.

Mehmet... (wêne) Navçeyêke Êlihê	Rêç Gazeke kimyevî	Dawera Argonê Hilbijarti	Nişe, not Hêlin	Navê giyayekî Tîpek	ihltal
3			6		
			Perestgeha k ezidayan Beşek ji laşê mirov		8
Serhildan				Qeymax	
Amûreke mûzîkê				Perestgeha İsevîyan	
	7	Şerîd			Tîpeke dengdar
		Tîpeke dengdar			Mêr
....ê Xelatê				Arîşe, pîrsîgîrêk Nexweşîye k	9
5					
Cinavkek		Tîpek	Tîpek dengdêr	Berepaşki alaveke şer	
1		Dengdêra 'har'	Tîştê eletewş	Sebzeyek	
Dawera azotê	Berhemên şîr				
Bi latîni 'ez'	Berepaşki Üfq				
		Berepaşki lawîk			
		Tîpa yekemîn	4		
Kurtenîvîs a DYA			Navekî mêran		
Rêxistinêk			Tîpek		
	2	Madeyêke kimyevî			

PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7 8 9



WELAT

ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (Imtiyaz Sahibi)
M. NURI
KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri
İstiklal cad. Asmalı
Mescit sok. 35/37
No:308
Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)
251 79 37-251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Berpirsê Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH
TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya
Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve
Yayıncılık San. Tic.
Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım

■ NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

München:
(Nûnerê Giştî yê
Ewropayê)

Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

■ Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

■ Swîsre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07

■ Bonn:
Ahmet Baraçalıkçı
49 228 66 17 40

■ Hollanda:
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43

■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yûsiv

Vardayoxî mardimên Yeşilî vejîyay

Pêriardin pêy ra, Birdalî rojnameyê tirkan ra pêdiyînî viraştî. Birdalî vat: "Ebi no vardayin qandê tepîştina çeteyan derfetêdo (îmkanêdo) gird kewto ma dest. Ek berpersanê dewlete wazenê çeteyanê Susurluk roşnî bîkrê, wa kesanê ke ferman dayê kiştixan tepîşê."



Mardimên ke da Serokê Mafanê Mardiman Akın Birdalî ro, amey tepîştin. No hefte, panc mardimên ke vera (hemberî) Akın Birdalî vardayin viraşt, ebi nameyê Cengiz Ersever, Hasan Hasanoglu, Bahri Eken, Kerem Deretarla, Ahmet Fulin hetê polîsanê tirk ra Stenbol û Enqere de amey tepîştin. Goreyê zanayînê ke edi rojnameyanê tirkan de vejîyayê, kiştixan qandê tertelêyêdo gird hedrekarin viraştê. Amey vaten ke çeteyan wastêne, HADEP'a Sarigazi rê vardayin virazê û heme mardimê edi banê HADEP de bikşê. Nê vardayoxan ra, Cengiz Ersever çawîşê pîspor o û edi qereqolê Silivri de girweyeno. Erseverî sûcê xo qebûl kerd û da zanayin

ke ey ferman Yeşilî ra giroto. Gorey vatenan, Erseverî planê vardayinî viraşt û serva tatbîqkerdena planî çend hebey kiştixî riştî cayê Komeleya Mafanê Mardiman. Fina, kiştixan diyar kerdê ke Silivri de kampa TIT a musnayin (perwerdehî) esto, înan wija de perwerdeyî (talîm) diyê û bahdo dest bi karê xo kerdê. Ancî vajîya ke kiştix hemverî resmê Birdalî talîm kerdo, armancê înan a biya ke, qurşunî vera serreyê ci bidê, la belê nêşa wîni bîkrê. Zek yeno zanayin Silivri verî jî, zey cayê kiştixanê kerdox nediyarîna (faîl meçhûlan) amey şinasnayin. Xeylê mardimê demokrat û azadîwaz zey karsazê kurd Savaş Buldan û embazanê ci, wija de amey kiştin.

Bahdê çend rojan, kiştixî Akın Birdalî ra ardî pê rî û ey kiştixan ra Bahri Eken û Kerem Deretarla şinasna.

Pêriardin pêy ra, Birdalî rojnameyê tirkan ra pêdiyînî viraştî. Birdalî vat: "Ebi no vardayin qandê tepîştina çeteyan derfetêdo (îmkanêdo) gird kewto ma dest. Ek berpersanê dewlete wazenê çeteyanê Susurluk roşnî bîkrê, wa kesanê ke ferman dayê kiştixan tepîşê."

Serokwezîrê Tirkiye Mesut Yılmaz roja 26'ê mengî de tewrî bernameya Arena bi û vardayinî şer ro vînayînê xo ardî zîwan. Goreyê vatenê Yılmazî kesên ke vardayin viraştê, rindîn û îstîqrarê Tirkiye nêwazenê. Peywendiyê înan ebi Yeşilî ra estê, ê wazenê îstîqra-

ra Tirkiye bixerpînê. Goreyê vînayîna Yılmazî, qandê eşkerkerdina çeteyan, tepîştina Yeşilî lazim o. La belê ey nêvat ke serva çi, ebi xo karê bincilkerdina kiştixan kerdibi û vatibi: "Kiştixî zereyê İHD ra yê û eleqayên înan PKK'ê ra estê." Çoşmeyê demokratîk no vatenan ser ro zaf hêrs bîbî û Yılmazî re wastibi ke wa şarî ra raverdina (lêborîn) xo biwazo. Tepîştina kiştixan pêy ra jî, a wasten amey finakerdin.

Gorey vengûvazên ke edi rojnameyanê tirkan de vejîyayê, edi pêserameyîna MGK de jî, na mesele ser ro amey vindartin. Heman (eynî) çimê danê zanayin ke, leşkerî jî ebi tepîştina kiştixan biyê kêfweş. Vajîya ke Cengiz Ersever artêş re çebiyabi, la belê ebi qerara mehkemeyî ageryawo karê xo. Çiyê ke raya giştî wazenê bizanê oyo ke, çima fermanarên artêşa tirk qandê Korkut Eken, Veli Küçük û JITEM'î vengê xo nêvejenê. Zek yeno zanayin, xeylê karê lîmînî ebi fermana Eken û Küçükî viraziyayê. Fina nameyê JITEM'î jî, xeylê karanê lîminan miyan de ravêrdû hewna jî nameyê nînano hemû karanê lîminan miyan de ravêreno.

Sazî û kesanê demokratîk eşkerkerdina çeteyan Susurlukî û peywendiyên înan ebi hêzên dewlete ra wazenê. Gorey nîrxandina înan, Yeşilî qandê dewlete xeftiyeno û peywendiya ci ebi leşkeran ra esta. Ebi taybet kesanê zey Korkut Eken, Veli Küçük zey endamê çeteyî yenê şinasnayin û tepîştina înan wazenê.

S. BERBEYAN

Stargeheke dîrokî:

Çiyayê Bagokê

Ku mirov li ser tahtekê wî rûne û li dengê bayê bakur û dengên çivîkan guhdarî bike, mirov fam dike ku çiqas mirovên egîd di vê deverê re derbas bûne. Tenê pêwîst e ku Çiyayê Bagokê bipeyive û ji mirov re bibêje ka ev dar û devî bi xwîna çend xort û keçên kurd hatine avdan. Her kulfîkekê bêhna şehîdekî jê tê. Li ser her tahtê şopa Mervanan, Hogiran, Egîtan, Xebatan, Serhildanan, Pilingan xuya ye.

*Çiyayê Bagokê bi dar e
Leşker hat ser bi hezar e*

Belê wiha dibêje stranbêj Dilgeş, ji bo Çiyayê Bagokê yî bi dar û devîyan xemilandî. Çiyayê Bagokê, wekî çiyayên Kurdistanê yên din, bilind, şênahî û xwedî stareke dîrokî ye. Çiya, ji rexê Mêrdînê, ji riyaya Nisêbînê û Midyadê ve dest pê dike û diçe hetanî rexê Cizîrê. Li bakurê çiyê, navçeyên Midyad, Mehsertê û Ezexê cih digirin. Li başûrê çiyê jî Nisêbîn û Beriya Mêrdînê hene. Bagok bi awirên xwe yî tûj li Binxetê (Başûrê Biçûk) dinihêre. Ew axa ji Çiyayê Bagokê herikiye, niha bi tîlên dîrokî bûye du cih. Riya Hevrêşim (Ipek) ku derbasî Iraqê dibe, di derdawên Çiyê re dihere. Li rojavayê çiyê bajarê Mêrdîn, Rişmil û Qubala hene, li rojhilatê çiyê jî Cizîrê dest pê dike. Di nexşeya erdnîgarî de, di masûrên Mêrdînê de xuya ye û bi Çiyayên Mazî ve girêdayî ye. Dîsa Gabar xwe spartiyê Bagokê û her du çiyayan destên xwe dane hev û din.

Bilindbûna Bagokê, ji behrê 1500 mt. ji beriyê 600 mt. ye. Wekî me li jor jî got, Bagok stargeheke dîrokî ye. Wekî hemû deverên Mêrdînê, li vê derê jî şopên Asûriyan bi hebet xuya dibin. Xerabeyên gundên kevnare, wekî bajarê Merdîs û Keleha Marîna ku di dema Bizansan de ava bûne, hêjayî temaşekirîne ne. Keleha Marîna li ser tahtekê bilind e û ji 12 sûran pêk tê. Li vê derê bi hezaran şeft hene. Dîsa bi sedan avahiyên bin erdê, hezazên bêbinî û gorên malbatî hene. Dema ku mirov şeftekê li ser rûyê erdê dibîne, mirov dibêje qey kortaleke ji rêzê ye. Lê dema mirov xwe bera hundirê wê dide, wekî xaniyên bi gelek ode û qul û qulase derdikevin pêşberî mirov. Di van odeyan de qulîne din hene û derbasî hin avahî û gorên din dibin. Wekî bajarên di bin erdê de. Bajarên kevnare Merdîs û Xerabeyên Bara şopên şaristanîyê radixin ber çavên mirov.

Bêguman mirovên wê demê ji bo mirovahiyê gelek tişt kirine. Lê niha ji wan tenê xerabe û gundên hilweşiyayî mane. Gundên vê derê ku niha xerabe ne. Wekî, Kîwaxê, Marînê, Badibê, Qesrê, Şewazê, Maragê, Merbeb. Dîsa dêrên wekî, Meryem, Maragî, Merbeb jî xerabe ne. Aniha jî şervanên azadiyê li ser van bingehên karê mirovahiyê dikin.

Şênahî û xweşikiya çiyê ku giş daristan e, nayê pesndan. Ji bilî darên Mazî û berî, darên fêkiyên cur bi cur, darên qizwanan, rezên tîrî

û bax û bexçeyên ku ne serî û ne dawî heye, hene. Ev şênahî wekî bihuştê ye.

Di derdawên çiyê de du kanî derdikevin. Tiştêkî balkêş e ku van kaniyan yek jê ava wê pir paqij e û yek jê jî nayê vexwarin. Jixwe navê yekê Ava Reş û ya din jî Ava Spî ye. Ev her du av dibin yek û di xaka Nisêbînê re derbasî Sûrî dibin. Li ser vê avê Bendava Çexçex çêkirine. Dêrdora vê bendavê jî bûye cihê ger û seyrane.

Belê.. Çiyayê Bagokê ewqas xweşik e ku mirov bi sedan rûpelan tijî bike, dîsa naqede. Ku mirov li ser tahtekî wî rûne û mirov li dengê bayê bakur û dengên çivîkan guhdarî bike, mirov fam dike ku çiqas mirovên egîd di vê deverê re derbas bûne. Tenê pêwîst e ku Çiyayê Bagokê bipeyive û ji mirov re bibêje ka ev dar û devî bi xwîna çend xort û keçên kurd hatine avdan. Her kulfîkekê bêhna şehîdekî jê tê. Li ser her tahtî şopa Mervanan, Hogiran, Egîtan, Xebatan, Serhildanan, Pilingan xuya ye. Karê mirovahiyê li ser Çiyayê Bagokê her hebûye û wê her hebe. Tu car dijmin nikare bi dest bixe û piyên şervanên mirovahiyê jî vê derê qut bike.

Li ser Çiyayê Bagokê, tenê Dilgeş dilê xwe rehet dike û dibêje:

*Li Mêrdînê li Bagokê
Ser dewam kir şev û rokê
Xwîn herikî eyn wekî cokê
Bijî şerê me li Bagokê*

*Çiyayê Bagokê bi dar e
Leşker hat ser bi hezar e
Li wir bûbû axir dewrê
Li ser serê çend hevalan
ÇETÎN MÎZAN*



Çiyayê Bagokê ji behrê 1500 mt. ji beriyê jî 600 mt. berztir e. Dora wî jî aliyê bakur ve bi Navçeyên Midyad, Mehsert û Ezexê, jî aliyê başûr ve jî bi Navçeyaya Nisêbîn, Beriya Mêrdînê; jî aliyê Rojava ve Mêrdîn Rişmil û Qubala jî aliyê Rojhilat ve jî ji bi Cizîrê hatiye dorpeçkirin; her wiha Çiyayê Gabarê jî jî vî aliyê ve xwe spartiyê Çiyayê Bagokê.